

**Le kwêwe bo kwê**

**Hêmin (1921-1986)**

**Kitêbî: Tarîk û rûn**

Min bo xom wam, renga zor kesîş wa bê, ke şîrî şa`îrêk ya nûsirawey nûserêk dexwênimewe - çi zîndû çi mirdû - pêm xoşe xoşî binasim. Bizanim kêye? Xelkî kam wilate? Karî çîye? Çon dejî û eger mirdûwe çon mirdûwe? Le kwê nêjrawe?

Boye biryarim da serguriştey xom le seretay em beşey dîwanekemda binûsim. Be kê m gutba ew sergurişte binûsê? Kê min le xom baştir denasê?

Pêwe bûm zor dirêjî binûsim. Temaşam kird debête çîrokêkî dirêj û şîrîn û pir karesat. Çi çîrokêk le beserhatî însanêk le waqî` nîzîktire? Ewîş beserhatî însanêkî nîzîkey penca salî le salekanî çerxî bîstem, ew çerxe seyr û semereye, ew çerxe pir kêşe û şer û şûre, ew çerxe pir le karesat û pelamare, ew çerxe pir şoriş û alugore webîr bê. Betaybetî eger ew însane kurd bê. Kurdêkî bêbeş û çarereş bê û ta radeyek le xebatî rizgarîxwazîy netewe zorlêkirawekeyda beşdarbûbê. Belam bedaxewe bom nekira. Beşî zorî leber tewezelîy xom. Ba bimênê bo helêkî tir eger mam wazî lê nahênim.

Xwênerî xoşewîst! Pêt wa nebê lêfem Leser hetîwan heldawetewe û le binî kûlekem dawê û herçîy heye nûsîwme. Na her wa kurte serguriştekem bo degêrmewe.

Şa`îrî hîç qazancî bo min nebûbê ew qazancey hebûwe ke ew nawe dûrudirêjey «seyd Muhemmed Emînî şêxelîslamî Mukirî» y le kol kirdûmetewe.

Bawikim nawî seyd Hesênî şêxelîslamî Mukirî bû, le torey mela Camîy Çorî bû ke sê sed sal lewepêş hatote Sabilax û binemalêkî gewrey lew melbende pêk hênawe.

Dayikim nawî Zeyneb û kiçî şêxî Burhan bû ke êsta binemaleyekî gewrey Mukiryanin.

Beharî salî 1300î hetawî (1921î zayînî) be şewî cêjinî beratê le gundî laçîn nîzîkî Sabilax ledayik bûm. Mêjukim le memikî dayikim nekirdûwe û firçkim be şîrî dayen girtûwe.

Dayikim zor car be çawî dadedamewe û deygut: to pêwqedem reş bûy. Her tom wezg kewt leşî saxm be xomewe nedî. Nexoşîm pêwe nûsa, kwêrewerî û pejare rûy tê kirdim. Leser mang û rojî xom bûm ke naçarbûyn birewîn û biçîne ladê. Ke ber bûyewe, ne min tilpatî terim le memikîda bû, ne bawikit sîpalêkî le malêda mabû.

Leşkirî Şikak êmeşî wek hemû xelkî Sabilax saf le saf talan kird û geskî lew nawimale da ke sê sed sal bû weseryek nirabû û be mîrat bo bawikit becê mabû.

Minîş carcar be pêkenînewe demgut daye giyan sûçî min çîye?

Dayenekem nawî Yasemen û xelkî Azerbaycan bû. Lelekem ke nawî Îzet bû xelkî Turkiya bû, ew dûwane leber hejarî û nedarîy xoyan perîwey Kurdistan bibûn û le gundekey ême gîrsabûnewe û le serûbendî ledayikbûnî minda mindalêkiyan bibû. Mindalekey ewan le min bextewertir bû, nejaybû û tûşî kwêrewerîy dinya nehatbû û emirî dirêjî bo min becê hêştûbû û parûy dayik û babîşî le ronî hawêştûbû.

Ew jin û piyawe hejar û aware be dil û giyan minyan bexêw dekird û zoryan xoş dewîstim. Minîş ogirî ewan bibûm wek dayik û babî xom xoşim dewîstin.

Lebîrme zimanî ewanim wek bilbil dezanî, ca nazanim turkîm dezanî ya azerî? Reng bê azerî bûbê, çunke mindal zimanî dayikî baştir fêr debê.

Mirdinî Îzet û toranî Yasemenim baş webîr dê. Em rûdawe yekem zebirî tund bû ke wehestî nasikî mindalaney min kewt û yekêke le bîrewerîye here talekanî jiyanim. Le rastîda min dû car hetîw bûm û dûcarim dayik û bab mirdûn: carêk be sawayî û carêk be pîrî.

Babim hem dewlemend bû, hem bedil û desbilaw, çakî bexêw dekirdîn, pênc xuşk û dû bira bûyn, kakim û xuşkêkim le min gewretir bûn. Be mindalî zor têrutesel û kok û poştêbûm. Belam koyle û dîl bûm, koyley naw qefezî zêr, koyley rêwşwênî kon.

Rêwşwênî binemalekeman îcazey nededa min legel hawtemenekanim galtewgep bikem.

Çunke min kure dewlemend bûm û ewan kure hejar. Min kurî şêxelîslamî benawbang bûm, ewan kurî ladêyîyekî bê nawunîşan. Min ber û pişt etles bûm û ewan kerrekirmanc. Min kok û poşte bûm û ewan rût û recal.

Ax... Gewrekanim tê nedegeyiştin min çend perêşan û kelelam, ewan neyandezanî bew kirdewey xoyan çon hestî min birîndar deken, birînek ke debête girîmaney rûhî û ta mirdin sarêj nabê.

Êstaş ke webîrim dêtewe kizem le cergî dê û xemêkî giran dam degirê, ke min le hemû xoşîy serdemî mindalî bê beş bûm. Lepêş çawî min mindalekanî gundekeman, ew reş û rûtaney hawşanî min nebûn! Be azadî û bêbakî galte û gemeyan dekird, le xak û xol degewzîn, le serbanan heldebezîn, le qur û çilpawda xarxarênyan dekird, Leser tepolk û kopeyn milaneyan degirt, Leser sehol xîskiyan dekird, Leser lode ka bazbazênyan dekird, begij yekda deçûn, pêk heldepirjan, aşt debûnewe, awroçkeyan dekirdewe û xanûçkeyan dirust dekird. Hêlane çolekeyan derdehêna, tebkeyan denawe. Helûkên, topên, hemzel, hengileşele, daye min mede be gurgî, helway be şepan, qereqerî û deyan core galtey dîkeyan dekird. Belam min bew tawaney ke necîbizade bûm debû wek gewre gewran le dîwexan Leser çok dabinîşim û mteqim leber neyete der! Bo bedbextî le malî êmeda nêrîney le min biçûktir nebû. Debû leber hemûyan yek pê hestim û ta îzinim neden leber destyan rawestim û danenîşim, ledûway hemûwan nan û çam bo dabinên. Çendim pê xoş bû ne keway mexmer û taqe û qutinî û xezelim leberda ba, ne pantolî Almanî zerdim le pêda ba, ne kaley şemamebendî awrîşim çinim le pêda ba û ne şedey sewzim Leser ba û ne piştênî peşimîney keskim le piştêda ba û wek mindale rûtelanekan azad bam.

Nelên maşalla kureke lew temeneşda azadîxwaz bûwe û hestî be ciyawazîy çîneyetî kirdûwe û riqî lê bûwe, nexêr newella ne azadîxwaz bûm û ne teremaş, wazim le geme û yarî bû û birawe.

Tenya bîrewerîyekî xoşim le zamanî mindalîm heye, ewîş eweye şewane deçûmewe jûrê û serim weser ranî daye Mirot dekird û ewîş hîkayetî bo dekirdim, ta xew deybirdimewe. Daye Mirot pîrêjinêkî dinyadîdey konsal bû. Bo xoy neydezanî temenî çende, belam bêguman zorî le sed sal helbuwardbû. Şeş piştî binemaley êmey dîbû, serspî û hawdemî dayikim bû. Rûhsûk, qsexoş û nuktebaz bû, hezaran neql û nezîley xoşî dezanî û boy degêramewe. Zor şitî benirx lew fêr bûm ke le jiyanda kelkim lê wergirtin. Rûhî şad bê.

Elfubêm le xizmet mamosta Se`îd Nakam xwênd, ke ew dem mêrimindal bûm. Kakim ke mamostay taybetî bo ragîrabû, zor le xwêndin detirsa û xerîk bû minîş bitirsênê û be meredî xoy berê. Belam mamosta Nakam nek her samî le xwêndin şikandim, belke têy geyandim xwêndin xoş û şîrîne. Pêş

ewey elfubê m pê binasênê bizinokê û merokey Husên Huzinî ewende bo xwêndbûmewe hemûm leber bû. Kitêbî *Encumenî edîbanî* Emîn Feyzîman hebû. Şî're galtekanî şêx Rezay fêr dekirim. Lebîrme qesîde dirêjekey Arif Saybim ke wa des pêdeka: «awareyî xakî weten û seyr û sefa xom» leserra bo xwarê leber bû, wek tûtî demxwêndewe û le manay nedegeyîştim.

Ke samim şika babim nardimye Sabilax ta le medresey dewletî bixwênim. Lepêşda zorim pê xoş bû. Le medresey «Se`adet» nawinûsîm kird. Belam ke rojî hewel çûme ser kilas toqîm û wextabû şêt bim. Min mindalêkî ladêyî nazdar bûm, le kurdî bew lawe hîç zimanîm nedezanî le medreseş kes neydwêra be kurdî qse bika.

Min le jiyanimda rojî reş û talim zor dîwn, belam rojî reştir û taltirim lew roje nedîwe ke çûme medrese. Mamostakem ke xoy kurd bû û dûwayeş têgeyîştim farsî baş nazanê, be farsî têy raxurîm hîçî tê negeyîştim. Hawdersekanîm ke hemûyan le min bawxoştir bûn pê kenîn, zor be xomda şikamewe. Maweyek be şew lebin lêfeda le tirsî medrese degiryam û beyanî beqrxemeresî deçûmewe. Mindal hemû galteyan pê dekirim û pêyan degutim «kirmanc». Le Mehabad be xelkî ladê delên kirmanc û be wişeyekî sûkî dezanin. Dûwaye boyan gêramewe deyangut be farsî cinêwman pê dawî û halî nebûy. Çabû sê çwar kurepûrim lew medrese deyanxwênd û leseryan dekirimewe. Dena mindale wirdke lewane bû şêtîm biken. Êstaş nazanim kwêra farsî fêr bûm û legel wez`eke rahatim.

Medresekeman xanûwêkî gewre û kon û kelawe bû. Taqe çaweyekî awdest hebû qet weber nedekewt. Mizgewtîman lê nîzîk bû, belam ne feraşî medrese deyhêşt wederkewîn û ne micêwrî mizgewt rêgay dedayn biçîne awdestî mizgewt. Boşkeyek awî çomî bogen le bin dîwarêk dandirabû, defirêkî tenekeyan Leser danabû, ew hemû mindale bew defire awyan dexwardewe. Hemîşe Leser çûne awdest û awxwardinewe şer lenêw şagirdekanda peyda debû û «nazim»-î medrese, ke piyawêkî zor zalim bû biyanûy wegîr dekewt ke darkaryan bika.

Jûrî ders xwêndinîman teng û tarîk bû. Pencerêkî têda bû ke lebatî şûşe kaxezî lê dirabû. Bo ewey rûnaktir bê kaxezekeyan be ron çewr kirdibû. Kursîyekanî çepirek û şikaw bûn. Mêz û kursî mamostaş le hî ême baştir nebû. Mamostakeman pîrepiyawêkî kwêremûşey zor tûre û tosin bû. Hemîşe sê çwar şûlî alûbalûy lûs û lêk û estûrî Leser mêzeke dandirabû. Her kes dersî nezanîba ya wirtey leber hatba der zor bêrehmane werdegera serûgwêlakî. Ta fêrî farsî bûm dû sê carî bîraz kirdim. Belam ledûwayîda lêy nedam. Ke mamosta çûba der şagirdêk ke pêyan degut «mubisîr» le cêgay ew dadenîşt. Erkî ewe bû her kes bizozî bika be mamosta bilê. Hemûman le mubisîr pitir detirsayn ta le mamosta. Hoy ewebû mamosta riqî le kes nebû û le xora le kesî nededa, belam mubisîr ewey nedezanî riqî le her kes baye ba hîçîşî nekirdiba şikayetî lê dekir û mamostaş bê lêpîrsînewe û pê rageyîştin deykuta.

Bernamey dersekanîşiman taze fikirî lê dekemewe zor giran bû. Ew salî wam rabuward û le axirî salêda yekêk bûm le baştirîn şagirdekani kilas û le îmtîhanî axirî salda zor baş derçûm.

Hawînê çûmewe gund. Heyf mamosta Nakam lewê nemabû. Belam mîrzayekîman hebû zor le mamostakey medresem xwêndewartir bû. Lekin ew û babim kitêbî dûwemim tewaw kird. Bernamey ewdemî wabû debû hemû kitêbeke leber bikey û min hemûm leber kirdibû.

Salî dûwem zor asûde bûm. Her meşiq û hîsab û dîkte mabû lewanîşda baş bûm. Boye her le hewe lew yekêk bûm le şagirde başekan û pê m wanîye lew salîda Leser ders le şûlêk ziyatiryan lédabim. Wez`î medreseş le par baştir bû, jûrekeman le hî par zor xoştir û rûnaktir bû, mamostakanîşiman baştir bûn. Belam yekiyan ke kurd bû û dersî farsî pê degutî zor tund û bezakûn bû, hemû rûhman lêy toqîbû. Mamostay hîsabîman azerî bû, farsî ewende xirap degut ke êmey mindal galteman pê dekir, belam hîsabî baş fêr kirdîn. Lebîrme êwarêk cedûwelî zerbî bo nûsînewe

û heryeke daneyekî daynê û halî kirdîn çonî leberkeyn. Gutî sbeynê êware lêtan depirsimewe û herkes rewanî nekirdibê xelet û şûlî lê dedem. Min ew şewey nenûstim ta leberim kird. Sbeynê lêy pirsînewe, kes nebû be tewawî leberî bê û wêy nekewê, tenanet min ke zor çakim leber kirdibû şûlêkim aferîmane her xward. Xoş ewe bû mamostay hîsabiman bo xoy lêy nededayn û mamostakey tirman ew zehmetey lebatî ew dekêşa.

Çwar klasim le medresey Se`adet û Pehlewî xwênd. Hawînanîş le gund lekin babim tomar û kitêbî îñşam dexwênd û leber xetî Emîr Nîzamî Gerûsî û mîrza Husênî Reşem denûsyewe. Îñşay farsî baş fêr bibûm û xetim yekcar xoş bû, zor le êstam xoştir denûsî.

Delên de`bay zîrek be dindûkê pêwe debê. Babim ke xet û îñşay minî dît, gutî role bûye mîrza û xwêndinî medrese bese, biço le medresey dînî bixwêne û cêy mela Camî Çorî bigirewe. Zorim pê naxoş bû dest le xwêndinî medrese helbigirim, nazanim bo hîç pêw xoş nebû bibime mela. Riqim le bergekeyan bû. Keway dirêj û teşk û paldêmi melayanem pê cwan nebû. Belam çar çbû? Hukimî hakime û derdî mufaca. Tesirîfî Zencanyan lebin hengil nam û hey dê bo xaneqay şêxî Burhan ta des bikem be rayele kirdin û alê babagutin. Ca paş maweyek keway awdamên leber bikem û sîwak le laser biçeqênim û şalî gergerî Leser bibestim û cêgay mela Camî Çorî bigirmewe û wecaxî binemalekeman kwêr nekemewe.

Çwar sal le xaneqa xwêndim ya baş eweye bilêm nem xwênd. Belam toley koyletî sawayetîm estandewe. Legel gelî xalozakanim ke wek beranî sultan Mehmûd berella û terxan bûn û le hîç cêgayek deng nedediran û kes berperçî nededanewe, gelêkim bedferî û bizozî û des bizêwî kird.

Neweşêx, ewîş neweşêxî çil sal lewey pêş eger kes destî weber neyenê û berperçî nedatewe le serûbendî bilûxda çi demênê neyka?

Ew çwar sale xoştirîn salekanî jiyani minin. Zor xoşiman radebuward. Desteyekî 8-9 kesî hawtemen bûyn, hemû xaloza û pûrza bûyn. Her Hejarman bêgane legel bû ke le xoman helnedebuward. Ewîş bo xoy zor qsexoş û xwênşîrîn bû û bawikîşî piyawêkî zor maqûl û le xaneqa zor xoşewîst bû.

مرد خردمند هنر پیشه را  
عمر دو بایست در این روزگا

تا به یکی تجربه آموختن  
با دگری تجربه بستن به کار

Bo piyawî xawen huner û zana dû car jiyani pêwîste ta le yekiyanda tecrebe weseryek binê û lewî tiryanda tecrebekey lekar bênê.

Destî şikaw û ranî wîrdim, ewî êstay dezanim eger ewdem demzanî kar le cêgayekî dîke bû û minîş şitêkî tir bûm. Berastî xaneqa zanistgayekî gewre bû û demtwanî zor şit fêr bim.

Xaneqay ew serdeme zor awedan bû. Xelk dehat û deroyî û kes heqî beser kesewe nebû. Feriq û ciyawazî zor kem bû. Carêkî dîkeşim gutûwe û dûpatay dekemewe detgut keştîy Nûhe. Le hemû tow û tore û regezêkî lê bû, penay bêkesan û lêqewmawan û awaran bû. Piyawçak, xoparêz, dîndar, musliman, mela, seyde, zana, xwêndewar, çete, diz, piyawkuj, nezani, şet, bêkare, pekkewte, kwêr, şel tenanet bêdînîş le bin mîçêkda ko bibûnewe û pêkewe dejiyan û hemû yek cîrenyanan werdegirt.

Efxanî, fars, turk, azerî û tenanet hîndîşî lê bûn. Kurdî hemû nawçekanî Kurdistanî lê hebûn. Ke be şêwey corbecor qseyan dekird û hî wa hebûn be zehmet têk degeyştin. Piyawî gewre û zana benawbangekanî ew serdemey Mukiryay wek mamosta Fewzî, Seyfî Qazî, Pêşewa Qazî Muhemmed, hacî mela Muhemmedî Şerefkendî, Elîxanî Emîrî betaybetî axa xwêndewar û zanakanî Feyzullabegî hatûçoy xaneqayan dekird û be mang û dû mang lewênderê demanewe. Melay gewre gewrey lê bûn û dersyan degutewe. Pir bû le suxte û muste`îdî baş. Kesêk wîstbay bixwênê û şit fêr bê cêgay xwêndin û şit fêrbûn bû. Belam min le kîsim çû û refaquetî xalozakanim û fiz û heway neweşêxî ney hêşt lew hele kelkî pêwîst wergirim. Bêcige lewe le mawey ew çwar saleda dûcar xirap nexoş kewtim û le xwêndin bûm. Carêk kewtûyîm girt û le mirdin geramewe. Tenanet deyangut awman bo gerim kirdûy û kifinman bo birîwî. Carêkî tir kwanêkî gewrem le lamil hat û şeş mang leberî kewtim û paşan emelyan kird û maweyekî dûrudirêj binawbûwêr bûm. Ew kwane be carêk hêz û biristî lê birîm û hergîz wek xom lê nehatewe. Min be mindalî qelew û ptew û behêz û hereket bûm. Kem mindalî hawtemenî xom be zorewanî derostim dehatin. Belam ke ew kwanem lê hat îtir hêz û twanam le kemayesî da.

Ew demî le Sabilax demxwênd «Hejar»im denasî, hatûçoy dukanî babî Hejarim dekird, melayekî pîrî zor qsexoş bû. Ke çûme xaneqa yektirman girtewe û bûyne dost. Carûbar xoman le galtewgep dedizyewe û şî`rman dexwêndinewe. Hemû şwênewarekanî Se`dî û Hafiz û Mewlewî û Kelîm û Sayb û şa`îre berzekanî farsiman pêkewe dexwêndewe û her têngîrawêyekî heşiman ba rehakirdinî hasan bû, xaneqa edîbî zor gewrey lê bûn, lêman depirsînewe. Mela Qadirêkî pîrî lerzî dengnûsawî lê bû, her be hal mabû. Eger bilêm ew melaye asarî Se`dî le xudî Se`dî baştir dezanî pêm waye mubalexem nekirdûwe. Keyfî bewe dehat şî`rêkî Se`dî lê bipirsyewe, ca bew denge nusaw û lerze se`atêk bot şî bikatewe. Xo şêx Muhemmedî xalim çi edîbêk bû min natwanim tarîfî bikem. Ew demî şereşeqî jiyan way lê nekirdibûm nawî xoşim lebîr biçêtewe. Her şî`rêkim xwêndbawe destbecê dehate berim. Hezaran şî`rî farsîm leber bû. Şî`rî kurdîşiman herçî wegîr kewtba legel Hejar deman nûsîyewe û leberman dekird.

Le axirîda min û Hejar be tewawî le taqimî kure şêxekan cwê bûynewe û şew û roj xerîkî şî`r xwêndinewe bûyn. Çend çîrokî gewre û çûkî wek Eskendername û Emîr Erselan û Şîroye û Husênî Kurdîman peydakirdin û xwêndimanewe. Şewî sêşemmu û cum`ey wa hebû hemû feqêyekanî xaneqa dekewtine layek û min û Hejarîş lelayek û şî`rêniman dekird. Birwa biken borman dedan.

Ew hemû şî`r xwêndinewe û refaquetî Hejar û hatûçoy mecîlîsî udebay xaneqa zewqî edebî le minda bewcûd hêna û tenanet şî`rî farsîşim degut. Belam tenya lerûm heldehat bo Hejaryan bixwênimewe. Ew xudagirtûweş lebatî ewey bom çak bika û hanim bida galtey pê dekirdim. Lebîrme carêkî şî`rî şa`îrêkî farsîm dizîbû û lenaw şî`rî xom axinîbû, bom xwêndewe. Gutî wella ewanî xot zor xirapn, belan hînekey îbinuyemîn zor başe. Zor be xomda şikamewe û destim lew kare narewaye helgirt. Xerîk bûm şitêk be şitêk bikem ke babim têgeyîst ew mawe umirem be zaye çûwe û le xaneqa nemxwêndûwe, ray gwêztim bo kulîce. Ewîş milkî xalim bû û mamosta Fewzî lewê melayetî dekird.

Debê bilêm min deskirdî Fewzîm. Ew helî weşandimewe û têkî helşêlam û serlenwê dirustî kirdimewe. Ew derkî zanîn û fêrbûnî bo kirdimewe. Ew rêgay jiyanî pê nîşan dam. Bêguman eger neçûbame xizmet Fewzî û lekin ew mamostayem nexwêndiba rêbazî jiyanim ew rêbaze nedebû ke girtim û pêyda royîştim û êstaş berim nedawe.

Ew têy geyandim min roley kurdim û kurdîş neteweyekî bêbeş û çarereş û zorlêkirawe û debê rolekanî lepênawî rizgarkirdinîda fîdakarî biken û lexoburdûyî nîşan biden. Ew fêrî kirdim zewqî edebîm çon tîftîfe bîdem û miştumalî bikem. Ew fêrî kirdim çon binûsim û çon şî`r bilêm. Ew fêrî kirdim wilatekem xoş bûwê û pêy helbilêm. Ew halî kirdim kurdî zimanêkî rewan û berbilaw û dewlemende û dekirê edebêkî gewre û dinyapesindî hebê.

Ew hacî Qadirî Koyî, Nalî, Kurdî, Salîm, Mewlewî, Herîq, Mehwî, Edeb û Wefayî pê nasandim û şî`rekanî ewanî bo şî kirdimewe. Ew fêrî rojnamexwêndinewe û roman xwêndinewey kirdim. Ew dîwanî şa`îre şorişgêrekanî farsî bo peydakirdim û hanî dam biyanxwênimewe û şityan lê fêrbim. Belam swêndî dam qet be farsî şî`r nelêm û heta bom dekirê be kurdî binûsim.

Sal û nîwêk le xizmet ew xwêndim. Beyanan legel gizîng dekewt, deçûme malî mamosta û zor rojî wa hebû, ta bangî nîwero y deda û mamosta heldesta bo nwêj dersim dexwênd û hîçiman mandû nedebûyn. Kem wabû leser kitêb dersim pê bilê, dur û gewherî nayabî le deryay qûl û bêbinî zanistî xoy derdênan û le koşî minî hejarî çaw ledestî dekiridin. Berastî mamosta û şagird nebûyn pîr û murîd bûyn. Min ta radey peristin ewm xoş dewîst û ewîş minî be kurî xoy dezanî. Eger rojêk nemdîba arezûm dekirid. Cum`e û sêşemmoman nebû. Ew le pêgeyandinimda be pele bû, minîş tamî têgeyîştinim kirdibû û qet le xwêndin û xwêndinewe û gwê ragirtin le mamosta werez nedebûm.

Paş nîwero yanîş lebatî mamosta dersim be kiç û kure giçkekanî xalim degut, ewîş dû qazancî hebû. Hem zanyarî xom berew jûr deçû û hem zehmetî mamostam kem dekiridewe.

Fewzî be birway min yekêke le gewrepiyawanî mêjûy Kurdistan, ke daxekem şwênewarekanî fewtan û xoşî lebîr çotewe. Ew lawe kurdaney le serdemî paşayetîy Rezaxanî Pehlewîda ke be teqlîdî ataturk xerîk bû gelî kurd le Kurdistanî Êranda bitwênêtewe û yekêk lew sê kuçke awre bû ke peymanî se`dabadî pêk hênbû, azayane kurdayetyan dekirid, ya rastewxo şagirdî Fewzî bûn ya şagirdî şagirdekanî ew. Betaybetî Pêşewa Qazî Muhemmedî şehîd şanazî bewewe dekirid ke şagirdî Fewzî bûwe.

Mela Ehmedî Fewzî ya melay Sulêmanî kê bû? Çi kare bû? Bo perîwey melbendî ême bibû? Nazanim. Min ewdemî ewendem mebest nebû ewane bizanim, le rûşim helnedehat lêy bipirsim, bo xoşî hîç basî xoy bo nekirdûm. Ewende dezanim deyangut xelkî şarî Sulêmanîye û le Kurdistanî Êraqewe legel şêxelîslamî gewreda ke le pêş babimda şêxelîslamî Mukiryân bûwe û her le binemaley mela Camî bûwe, hatote Mukiryân. Paş mirdinî şêxelîslam jinekey ewî mare kirdibowe û kiçêkî lê hebû ke be cwanemergî mird. Jinêkî dîkeşî hêna û kiçêkî tirîşî lewî bû. Wa bizanim mawe û mêrdî kirdûwe. Bo xoy le salî 1322 (1943) da le gundî Hacî Kend mird û le xaneqay şêxî Burhan nêjrawe. Kitêb û nûsînekanî wegîr zawakey kewtin ke hîwadarim nefewtabin. Wek bîstûme paş mirdinî 140 timen diraw û dû maynî mîrat lê becê mawe.

Fewzî zanayekî gewre, edîbêkî kemwêne, kurdêkî pak û bêbak bû. Belam şa`îrêkî baş nebû. Bîrêkî tîj û wîrdî hebû, emma teb`ekey ewende rewan nebû bitwanê bîxate naw çwarçêwey şî`rî erûzîyewe. Ew demîş şî`rî spî nebîbûwe baw. Carûbar şî`rî xoy bo dexwêndimewe. Belam hîç bedilim nebûn. Carêkî qesîdeyekî dirêjî farsî bo xwêndimewe û neşîgut pêt çon bû? Gutim baş nebû. Wa diyar bû xoşî zorî xoş nedewîst pêkenî û gutî: hî xome. Belam bo kes wek to bîr û birway xoy dernabirê û bo herkesim xwêndotewe gutûyane zor başe? Gutim qurban lesayey towe min wam lê hatûwe şî`rî baş û xirap lêk bikemewe. Ewcar qaça pêkenî û gutî diyare nek her baş nîn, belke xirapîşin û kaxezekey wîrd wîrd kird.

Diro nebê le xoym nebîstûwe, belam bîstûme zor dostî Arîf Sayb bûwe. Eweşim bîstûwe çend car Mehmûd Cewdet hatote Mukiryân û le malî ewda xoy şardotewe û legel xelk temasî siyasî girtûwe, tenanet bîstûme «Komeley Jînewe»-şyan dirust kirdûwe. Belam her guteye û zor cêgay mtimane nîye. Mamosta xezelêkî Hafîzî texmîs kirdibû ke lenaw şî`rekanîda pesindim kirdibû. Eweş bendêk lew texmîseye ke be birway min westayaneye.

گهی وزیر و بدرگاه پادشاه محبوب  
گهی شوی بسر دار ناگهان مصلوب  
به چشم عقل در این رهگذار پر آشوب  
جهان و کار جهان بی ثبات و بی محل است

Bêcige le Fewzî min le kulîce mamostayekî dîkeşim hebû ke zorî lî fêr bûm. Seyd Ewlay seyde Mîne piyawêkî yekcar dizêw û naşîrîn û zor naqola û nalebar û zor şiprêw û aloz bû. Nexwêndewar bû, belam zor zana û têgeyiştû bû. Renge bilên nexwêndewar û zana wek kole û şaxdare û çon şitî wa debê? Belê ew piyawe neyxwêndbû, tenanet herfêkîşî nenedasî. Belam le edebî farsî û kurdîda destêkî balay hebû. Herçî carêkî gwê lê bûba dehate berî û qetî lebîr nedeçowe. Beşî zorî Şanamey Fîrdewsî, Xemsey Nîzamî, Mesinewî, xezelyatî Se`dî û betaybetî sertaserî dîwanî Hafizî leber bû. Xo basî şî`rî şa`îrekanî kurd her nakem. Kam şî`rî here giranit lê pirsîbawe wirtîrîn me`nay lê dedawe. Lebîrme carêk konemelayek ew şî`re farsîyey lê pirsîmewe:

آنچه بر من می رود گر بر شتر رفتی ز غم  
می زدندی کافران در جنت الماوا قدم

Min êstaş û ew demîş ew core şî`ranem pê xoş nebûn û nîn, nemzanî û mela galtey pê kirdim. Le xal Ewlam pirsîyewe gutî hey leminet nekewê, ewe îşare bew ayeteye kafir hengîn deçine beheşt ke wiştir le kunî derzîyewe biçê. Yanî ewî le şa`îr qewmawe eger le wiştir qewmaba wa barîk debû le kunî derzîyewe deçû û kafirîş be beheşt werdebûn.

Bo xoşî şî`rî degut û be xwêndewarêk deynûsînewe. Şî`rekanî wek şî`rî şa`îrekanî pêşûman pir bûn le wirdekarî şa`îrane û wişey bêgane. Belam le goranî gutinda bendî way degutin serbeser gewheryan dêna. Wişey sakarî kurdî û qafyey cwan û manay wirdyan hebû. Ew dû şî`rey ewm lebîr mawin:

Cefa û wefa, rastî û diro  
Bûne kirdewey emin û eto

Cefa pîşey to wefa pîşey min  
Emin repurast eto dirozin

Selt û reben bû, le dîwexanî xalim dejya. Be tewawî me`nay kelîme hunermend bû. Gwêy nededa ser û berg û demuçawî, zor berzefir bû, çawî le berat û xelat û şabaş û diyarî nebû. Dengî xoş bû, bo xoy û bo dilî xoy goranî degut. Bo xoy wazî lê neba, şaş leberî parabawe mteqî lê nedehat. Çak legel min rêk kewtbû. Şewane pêkewe le dîwexan demaynewe. Min kitêbim bo dexwêndewe û ew beytî bo degutim. Min lew beytanewe fêrî wişey resenî kurdî bûm. Eger mamosta Fewzî şa`îre berzekanî kurdî pê nasandim û edebî farsî fêrkirdim, seyde ewlaş folkilorî edebî konî netewekemî pê nasandim û fêrî wişey resenî kurdî kirdim. Hawnişînîy seyde ewla te`sîrêkî qûlî le jiyânî edebî minda hebû û êstaş heyetî. Ew piyawe nexwêndeware yekêke le mamosta here gewre û benirxekanî min.

Ba eweş bilêm min le kulîce bo yekem car û axir car aşiq bûm, îşiqêkî pir soz û kul û efilatûnî, îşiqêkî pak û xawên û asimanî, îşiqêkî sakar û mindalane û dûr le hewes û hewa. Belam ew îşiqe zorî

nexayand, zorî dewam nekird. Ew girukife zû damirka û xolemêşî feramoşî daypoşî. Girawyekem galtey be hestî pakî min kird. Ew le min beezimûntir bû, ew hewesbaz bû ne aşîq. Belam herçî bû ew girukifeş teşîrî Leser qerîhey şaîraney min bû.

Salî 1317 ke lawêkî 17 sale bûm, mamostakem le kulîce royîşt û minîş destim le xwêndin helgirt û çûmewe malê û destim kird be karûkasbî. Êsta maliman le gundî Şîlanawê bû, babim samanekey caranî nemabû. Belam hîmetekey her mabû. Bira û amozakanî lê cwê bibûnewe û her gundêkî bo mabowe. Çak xerîkî kasbî bûm û zû fêrî karî kiştukal kiram. Be roj karim dekirî û be şew mutala. Herçend kitêb û rojname kirîba babim destî weber destî nedehe nam. Zor şewî wa bû ta berî beyan nedenûstim û temaşam dekirî. Birwam pê biken jwanî legel kîjanîm leber xwêndinewey kitêb lebîr çotewe û lêm torawin û gileyîyan lê kirdûm. Ew rojey piyawiman le şar dehatewe û kitêb û rojnamey bo dênam nîwêkî rêgay bepîrewewe deçûm.

Çapemenî ew serdemî Êran pêşkewtû nebû. Çend gowarî wênedar û cwan derdeçûn, ke lelayan sefaretî Almanî nazîyewe yarmetî dediran û be qazancî nazîsimyan denûsî. Kitêbî siyasîy ew demî hemû lebarey Hîtler û Mosolîna bûn. Rojnamekanîş tebilîxatyan bo Alman dekirî û be bejin û balay Pehlewîyan heldeket. Tenya rojnameyek ke ew demî şîrîn bû û ta jiyaş her şîrintir bû û nehlet lew kesey mirandî «Tewfîq» bû. Ew rojnameye rojanî pêncşemmu derdeçû û le hemû jimareyekda deynûsî: «şewî cum`e dû şitit lebîr neçê. Dûhem rojnamey Tewfîq». Min reben bûm, dena ewî tirîşim lebîr deçû. Belam şewî cum`e Tewfîqim lebîr nedeçowe.

Ew çîrokane terceme dekirî ziyatir polîsî bûn. Çîrokinûsî zor çak hêşt le Êran peyda nebibû, belam min bojom nedekird û hemû şitim dexwêndewe. Hatûçoy Mehabadîşim dekirî û dost û aşinay çakim peyda kirdibûn. Carê ewe erkêk bû babim pêy espardebûm herçend carê çûbame şar debû biçime mehkemey Qazî Muhemmed û dîwexanî mîrza Rehmetî Şafîî û silawî babimyan pê bigeyenim. Ew dû cêgaye qewxatîrîn dîwexanî Mehabad bûn û xelkiyan zor lê debû û wîrdewirde çaw û gwê m dekirawe û gewrepiyawekanî wilatim denasîn û ewanîş leber xatîrî babim hurmetyan degirtim.

Bêcige lew dû cêgaye ke eger leber qsey babim neba hênde nedeçûm, cêgayekî tirîş hebû ke nakirê nawî bînim. Ew cêgaye mekoy ew lawane bû ke heway nîştimanperwerîyan kewtbûwe ser. Zebîhî û Resulî Mîkayîlî, Qzîlcî û Nanewazade û Îlahî û Seydî û zor kesî tirim lewê nasîn. Hejarîş herçend carî hatba şarî be malî êmeda dehat.

Ew refîqane korî edebîy biçûkî kurdyan pêk dêna û be nihênî şîrî kurdîyan dexwêndewe. Deyan narde Kurdistanî Êraq û herçî kitêbî lewê çapkiraban boyan dehat û deyanda be minîş. Qet nempîrsî kê botan denêrê û kê deyanhênê? Min kalekxor bûm ne bêstanrin. Çend şaîrîş hebûn şîrî xoyan be nihênî bilaw dekirde. Betaybetî şîrekanî Seyfî Qazî û ... agiryan dekirde.

Salî 1320 (1941) min lawêkî pêgeyiştû bûm. Le karûbarî kiştukal û ajeldarî karam bibûm û le edebiyatî farsî û kurdîşda şarezayî tewawim peyda kirdibû. Bo xoşim şîrim dadena. Dîwanêkî gewrem dirust kirdibû. Babim egerçî bo xoy ehlî zewq bû û şîrî zor pê xoş bû, zorî pê naxoş bû min bibime şaîr. Lekin ew bibiray bibiray basî şaîrîy xom nedekird. Defterî şîrekanîm wek bêçûwe pişîle le babim deşardewe.

Rojêk xerîkî şîrî nûsînewe bûm. Karêkim hate pêş wederkewtim û defterekem le gorê becê hêşt. Tirsî wem nebû babim lew wexteda bête dîwexan. Zorim pê neçû ke hatimewe defteresûr diyar nebû. Pirsyarim kird gutyan babit destî daye û birdî, le piştên berejêrim mird. Pêm wa nebû behasanî necatim debê. Zanîm xirapm lê qewmawe. Şîrekanîm puxte nebûn, lasay şaîre konekanîm kirdibowe. Hemû core şîrêkim danabû. Tenanet le firhawêştinda lasay şêx Reza û Îrec Mîrzay farsîşim kirdibowe. Boye heqîm bû bitirsim. Galte nebû, min hem şaîr bûm û hem îtirafm be gunah kirdibû, ba be xeyalîş bê. Minîş wek şêx Reza buxtanim be xom kirdibû û babim şitî way pê qbûl nedekira,



belam wa diyarbû neyxbêndbûnewe. Çûmewe jûrê û gutim eger kareke gend bû dayikim dekeme tikakar. Pirsîm, gutim kwa babim? Gutyan betûreyî çûwe mitbex. Xom wepena da, be bolebol hateder û leber xoyewe deygut: xwêrî karim bo fêr bûwe. Şa`îrî şa`îrî! Deyewê lebirsan bimirê. Xom be mitbexda kird, temaşam kird defteresûr leser kilî tendûr bote qeqnes.

Ew demî zorim peroş bû, belam paşan gutim destî xoş bê. Çunke bêguman êsta maban bo xom demsûtandin. Raste hemû mewzûn bûn û qafyeyan hebû, belam lasakirdinewey tewawbûn û hestî şa`îraney xomyan kem têda bû. Paşanîş zorî wam firê dawin.

Bêcige le karûkasbî rojane û mutala û xwêndinewey şewane le dê sergerimîy dîkeşim bûn, swarî û teqle û rimbazî û rawe kew û rawe tajî û rawe tifeng.

Babim espî zor resen û başî hebûn ke zorî xoş dewîstin û başî aga lê bûn. Min û kakim hemîşe esp û mayînî taybetî xoman hebû. Hîçiman heqiman nebû swarî espî ewî tir bîn, diyare kakim serpişk bû û espî baştirî bo xoy heldebijard. Belam le dûwayîda hemîşe espî min baştir derdeçûn. Çunke lewî hêdîtir bûm û kemtirim mandû dekirdin û lewî bemşûrtir bûm û çaktirim aga lê debûn û baştirim bexêw dekirdin. Zorcarîş giriney tê dehalandim û espekey lê destandimewe û yekî dîkey dedamê. Belam babim boy tê heldehênamewe û esp û mayînekanî tirî deda be min swaryan bim û te`lîmyan bidem. Swarêkî baş bûm û wilaxm çak de`amilandin. Belam qet rawerî çak nebûm. Ne temal û diyardîm baş dedîtewe, ne şwênim çak degêra, ne dawim bepele bo deçeqa, ne tifengim baş dengawt. Diyare be tapir kem wa bû le herdî bibûwêrim. Belam nemdegeyande ew tifengçîyaney le hewa neyandebuward.

Rojanî cêjin û bûkhênan û xenebendan û kiç bemêrdan dawet û reşbelekiman degirt. Hemû carê piyawêkî maqûl û ridênsîman denarde kin babim û îcazeman lê werdegirt. Hemû carê muxalefetî dekird, belam hêndî leber deparaynewe dehate redaye û bew şertey le nedîwî dîwexanî ême dawet bigîrê îzinî dedayn. Berastî xoş bû, kiç û kur û jin û piyawî gundekeman heldeperîn. Min ew resmem le reşbelekî ladêda zor pê cwan bû ke piyaw meger jin bo xoy bangî kirdiba, dena heqî nebû biçête destî doyan. Piyaw debû hemîşe lepêşewera biçête nêw gerî dawet, dena eyb bû. Belam do debû le paşewera bête naw dawet û helbijardin be xoy bû. Ew resme degerêtewe ser ew zemaney ke jin le Kurdewarîda azadîy pitir bûwe.

Bo şewdawet îcazeman le kes wernedegirt. Şewî mangeşewî hawîn le hewîşey merî kiç û kurî awedanî têkel debûn û dawetyan degirt û hemîşe ledûy minîşyan denard. Zistanan le axel û holanda şewdawetiman degirtin. Carcare sofîy şeytan û şofar xeberî ew şewdawetaneyan be babim radegeyand, ewîş lepêşda cinêwî be min û dûwaye be çend kurechêley dê deda û kemêkî hereşe lê dekirdin û debirawe. Belam be qsey şeytan û şofar destiman le şewdawet helnedegirt û cinêwî gewranîş be qewlî kurechêlekan xelat bû.

Zistanan be şew corabên û kalemistên û feley bêdeng û kosebazî û terkî bin bereyan le mizgewt dekird û be roj cgen û matên û mêşên û hêlkeşkên û şêruxetyan dekird. Min ta kitêbim wegîr kewtbaye le dîwexanî xoman weder nedekewtim û nedeçûme seyrî ewane. Belam sere beharan hemû rojê deçûme topên.

Le mangî xermananî 1320 (1941) rojêkî çûbûme ser xermanan. Kirêkarekaniman xerîkî malûsk û zirîngandinewe û balekew bûn û minîş lekinyan danîştbum û espekem weser kwêzir kirdibû. Ew demî firoke û maşên zor kem bûn û xelk pêy seyr bûn. Lepir dû firokey reşî zalam peyda bûn. Ême ta wêsta firokey ewende zliman be asimanewe nedîbû. Hemû destyan le kar helgirt û temaşay firokekanyan dekird. Dîman firokekan nîzik bûnewe û newî bûn û kaxezyan berdanewe. Hemûyan rayankird bizanin çîye? Jinêk lepêş hemûwanda gerawe û kaxezêkî damê û gutî ha be qurbanit debim bîxwênewe bizane çîye û çê têda nûsirawe?

Birwa biken wextabû le xoşîyan bal bigirim. Ew kaxeze beyannamêk bû ke be zimanî kurdî nûsirabû. Çon ewe xewine, ya rastîye? Dewletêkî gewrey wek Yekêtîy Sowyet be zimanî kurdî beyanname bilaw bikatewe? Bo min herwa kem nebû.

Bo min ke şêt û şeyday zimanî kurdî bûm ew pere kaxeze bes bû ke le xoşîyan şageşkem bika. Ew demî wa wirdim lêk nedabowe, belam le waqî da le barî siyasîyewe ew karey dewletî Şûrewî ewperî azadîxwazîyêda bû û nişaney ewe bû ke ew dewlete îtiraf be bûnî gelanî corbecorî Êran deka.

Ew beyanname bonî şerî lê dehat. Diyarbû leşkirî sûr hatbû de Êranewe. Herçend le beyannamekeda dilxoşîy xelkiyan dabowe û hereşe û şitî way têda nebû, belam ême zor le rûsan detirsayn. Pîrekan neqlî bedferî û bêrehmî û destweşênîy leşkirî Tezaryan le şerî yekemda bo gêrabûynewe. Le sertaserî rojgarî hikûmetî Pehlewîda rojnamekanî Êran her şitî xirapiyan le dijî Şûrewî nûsîbû. Balşwîk lew serdemeda le Êran gewretirîn cinêw bû. Xo betaybetî paş ewey şer lenêwan Almanî nazî û Yekêtîy Sowyetida helgîrsa, çapemenîy Êran hemû nûsînekanyan be sûdî Alman û be ziyânî Şûrewî bû. Maweyek bû şarewanîy Mehabad radyoyekî hênabû û bernamekanî «Bîrlenî» be zimanî farsî bilaw dekirde, ke sertapa cinêw be komonîzim û balşwêzim bû.

Belam ewane hîçî bo min lew wexteda giring nebûn. Giring ewe bû kurd mîlletêke dewletan deynasin û beyanname be zimanî ew bilaw dekenewe.

Nazanim çon xom geyande espekem û swar bûm û pêm pêwena û leser cilewan çûmewe mal, beyannamekem bo babim xwêndewe. Belam ew bepêçewaney min rengî bizirka, şleja û be kawexo gutî: role qewma, wa diyare rûs hatûne de Êranewe, şer û kêşe peyda debê, wilat deşewê. Kurî xom to netdîwn û nayannasî, zor xirapn, zor piyawkuj û bêbezeyî û destireşin. Min kuştarî Sabilaxim be çawî xom dîwe û le bîrme çon xelkî bêderetan û lêqewmawyan beşîran şequpeq dekirde. Debê zû xoman xir keynewe û xo bigeyenîne qayme. Xuda bimanparêzê. Rojî piyawane, bo ew roje bû demgut fêrî swarî û tifeng hawîştin bin. Boy mat bû û dû sê car leber xoyewe gutî: «herzin û bizin çiyaye mezin».

Babim heqî bû nîgeran bê çunke ew leşkirî Tezarî dîbû. Ew kuştarî bêrehmaney jenerale koneperistekaniî rûsî le Kurdistanda dîbû. Ew wekû zorbey êranîyekan agay le alugorî paş şorişî oktober le Yekêtîy Sowyetida nebû. Neydezanî leşkirî sûr çon amilawe.

Bo êwarê çend piyawî maqûlî Mehabad peyda bûn. Ewanîş dost û hawtemenî babim bûn. Şerî yekemyan webîr dehat. Zor le babim pitir nîgeran bûn. Yekiyan gêrayewe û gutî no kes le binemaley ême be rojêk bedestî saldatî rûs kujrawin.

Ew qşane minîşî birêk nîgeran kirdibû. Belam le xoşîy beyannameke her şayîm le dilda degera. Xerîkî xizmetî mîwanekan bûm, belam her demenademêk beyannamekem derdêna û demxwêndewe û serlenwê le tenkey gîrfanim denawe.

Şew kakim û piyawekaniman çûn û jin û mindalî ew mîwanane û xizmekaniî xomanyan le şar hênader. Beyanî dû firoke hatin û çend narincokî biçûkiyan be şarda da, erteşî şahenşahî, ew erteşey le kuştinî mîlletî Êranda lasay dagîrkeraniî mexûl û nazî dekirde, tawêkî berberekanî nekird û pêş ewey leşkirî sûr bigate Mehabad çekî firê da û wek towî herzin bilaw bû. Hejar lew barewe her ew dem çend cwanî gut:

Be bilawbûnî dû per agahî  
Bû bilaw erteşî şehenşahî

Tifengî birinoyan deda be nanêk. Ewîş ewî azayan, dena ewî tirsenok bertîlî deda tifengekey lê wergerin.

Beşî zorî xelkî Mehabad rûyan le gundekey ême kird. Babim pêşwazêkî başî lê kirdin û herçî heman bû le îxtyarî nan. Embarî genimî kirdewe û aşekanî gundekemanî da be xelk û her kes herçendî ard wîstba deyandaye.

Hemû rojê caryan dekêşa her kes herçî pêwîste bê lerûdaman û şerimkirdin dawa bika. Xelkî Mehabad ew piyawetîyey babimyan lebîr neçû û ta ma zoryan îhtiram girt.

Çwar pênc roj kes beser kesewe nebû. Lepêşda leşkirî îngilîs geyiştê Sabilax û destêkiyan reser barxane xist û çekî qursyan bird. Dûwaye leşkirî sûr hat. Bepêçewaney ewey çawenorî dekira ne kesyan kuşt, ne kesyan talan kird, ne azaryan be kes geyand. Ewende baş legel xelk cûlanewe ke kes be leşkirî dagîrkerî nedezanîn. Neqlêkî xoşim webîrhatewe: le zemanî Pehlewîda kabirayekî diz û çete û piyawkuj û xirap peyda bû, be taqî tenê kelegayî le xelk dekird. Kete pênc tîrêkî konî pê bû û lew naweda degera û herçî wazî lê ba deykird. Polîsî Êran boy nedegîra, belam zanîbay çote her malêk xawen malekey degirt. Kabirayekî pîryan bew tawane girtibû ke şewêk «soxire» yanî ew çete piyawxirape nanî le malî xwardbû, dû sal bû le wirimê gîrabû. Ke hatewe pêwey çûm û gutim mame çonit necat bû? Gutî çûzanim, firîştêkî sûrî çawîşîn hat û derkî lê kirdimewe û gutî biro.

Leşkirî Taran le Mukiryman nema. Lepêşda eşîretakan ta radeyek alozîyan kird û yektiryman kuşt, belam wîrdewirde wilat aram bowe û wez`êkî lebar bo cûlanewey siyasî pêk hat.

Ême, yanî ew pole lawey le zemanî Pehlewîyewe yektirman girtibû û dostane pêkewe karman dekird, meydanîman bo awela bowe û çalakîy xoman pere pê da. Demannarde Êraq rojname û gowarî kurdîyan bo dehênayn û demanxwêndewe. Min şî`rî xom û şî`rî şa`îrekanî tirim be xet bo lawekan denûsînewe û bilawim dekirdinewe. Dilşadî Resûlî le Êraqewe hatbowe. Ew îmilay kurdî le hî ême baştir bû û xetîşî xoştir bû û zorîşî şî`rî Bêkes û Pîremêrd û Ehmed Muxtar Caf û Hemdî leber bûn û be xet bilawî dekirdinewe. Gowarî Gelawêj rolêkî başî yarî kird û lawekaniman fêrî kurdî xwêndinewe bûn. Helûmerc bo pêkhatinî hîzbêkî nasîyonalîstî kurdî le Mehabad pêk hatbû.

Paş damezirandinî hîzbî Tudey Êran çapemenîyekanî ew hîzbeş alugorêkî fikirîyan lenaw komelî Kurdewarîda pêk hênabû. Tenanet çend kesî kurd û ermenî têkoşan lkî ew hîzbe le Mukiryman dabimezirênin, belam xelk pêşwazî lê nekirdin. Hîzbêkîş be nawî hîzbî Azadî be bernameyekî çepîyewe serî helda û nejya. Ta rojî 25î gelawêjî 1321 (16î abî 1942) «Komeley J. K» damezira. Ewanî ew Komeleyan damezirand dostanî pêşûy min bûn. Min lew serûbendîda le Tewrêz bûm û le rojî damezirandinî Komeleda huzûrim nebû. Ke hatimewe behoy Zebîhî ke lemêj sal bû dost bûyn be Komele nasêndiram. Le malî yekêk le dostekanî xom ke paşan zanîm endamî jimare yekî Komeleye û berastî têkoşerêkî becerg û aza û nebez û kolineder bû, be quran û be alay Kurdistan û be şerefî xom û be şimşêr swêndyan dam ke be ziman û be qelem û be îşare xeyanet be netewey kurd û endamî Komele nekem. Nawî nehênîy hîzbîm «Hêmin» bû û jimarey endametîm 55. Min heqim nebû hîç lewan bipirsim, belam ewan ewendeyan mutimane be min bû, pêm bilên Hejarîş endamî Komeleye û xot lekin ew meşarewe eweş bew radegeyenîn.

Bew core min le jîyanî komelayetî û siyasî û edebîmda pêm naye qonaxêkî nwê.

Endametîy Komeley «J. K» goranêkî seyrî beser minda hêna. Şewuroj le bîrî Komeleda bûm ke ewîş amancî rizgarkirdinî netewekem bû. Hemû awat û arezûy taybetîy xom wela na. Îtir netenya destim le şewdawet û helperîn û rêbazgirtin û leser swane westan helgirt, belkû wek sofîy tobekekar tûşî her kîj û jinêkî kurd dehatim serim dadexist û çawim lê nedekird. Çunke eweşim be xeyanet dezanî. Bo xatirî

Komele min destim le yarêk helgirt ke be gewretirîn mehrûmîyetî jiyanimî dezanim û rabirdinî zemanîş lebîrî nebîrdûmewe û nasorî le dilimda her mawe.

Lew salaney dûwayîda dostêkim ke baş le şî`r, betaybetî le sebikî şa`îrîy min, dega gutî to bo gutûte: aşiqî çawî kejal û gerdinî pir xal nîym? Gutim kake min qet dirom legel îhsasî derûnî xom nekirdûwe. Eger to detzanî min ew şî`rem le çi helûmercêkda gutûwe, birwat dekird hestî derûnî xom derbirîwe û berastî lew kateda min le xeyalî çawî kejal û gerdinî pir xalda nebûm.

Komele bêcige lewey komeleyekî siyasî bû komeleyekî komelayetî û exlaqîş bû. Zorbey endamanî Komele birwayan bew swênde hebû ke xwardbûyan û destyan le akarî dizêw helgirtibû. Dizî, xirape û nêwan naxoşî le kizî dabû û detwanim bilêm le hêndêk cêgayan her nema.

Hêndey pê neçû Komele seranserî Kurdistanî Êranî tenîyewe û pelî hawîşt bo parçekanî tirî Kurdistan, betaybetî le Kurdistanî Êraqda lkî Komele zor perey girt û behêz bû.

Endamanî Komele le hemû çîn û twêjekanî komelî Kurdewarî pêk hatbûn û ciyawazîy bîrûbawerî siyasî û felsfeyîyan hebû. Eger çawêk be organî Komeleda bixşênin ew rastîyetan bo derdekewê, ke min lêreda mecalim nîye botan şî bikemewe. Belam hemû leser şitêk rêk kewtbûn. Ewîş rizgarîy Kurdistan bû. Endamî Komele xawenî her bîrûbirwayek ba û le her çîn û twêjêk baye bo fermanî lay serû nek amade belke berastî fîdayî bû.

Dahatî Komele tenya û tenya manganey endaman û firoşî çapemenîyekan û dahatî tîatir û numayîşekanî bû. Keçî zor bebaşî berêwe deçû. Hoy ewe bû hemû kes bewperî dilxoşîyewe manganey deda û çapemenîy Komeley be çend hêndey nîrxî diyarîkiraw dekirî. Min xom dîwme jimarey «Nîştîman»yan be 200 ewendey nîrxey kirîwe, Nîştîman qet daneyekî nedemawe. Komele lepêşda kitêbêkî biçûkî şî`rî bilaw kirdewe be nawî diyarî Komeley «J. K» ke şî`re nîştîmanîyekanî hacî Qadir û Melay Gewrey Koye û Hejar û şêx Ehmedî Hîsamî têda çapkirabûn û desbecê tewawbû, dûwaye gowarî Nîştîmanî wek organî Komele çap kird.

Yekem şî`rî min le jimare dûy Nîştîmanda be nawî M. Ş. Hêmin bilaw kirayewe û îtir bûme endamî destey nûseranî ew goware û le hemû jimarekanîda şî`r û witarim bilaw kirdewe.

Zebîhî sernûserî Nîştîman bû û berastî le çapkirdinî ew gowareda zehmetî kêşa û wiryayî nîşan da. Cige le Zebîhî û çend kesî bawerpêkirawî tir kes destey nûseranî Nîştîmanî nedenasî û neydezanî ew goware le kwê çap dekirê.

Endamî Komele wek endamî hîzbêkî nehênî û be dîsplînî tund her ewendey dezanî ke pêwîst bû bîzanê.

Lebîrme Nîştîmanim bo babim dexwêndewe. Betaybetî şî`rekanî xom û deygut kure ew Hêmine kêye? Ledilî xomda pêdekenîm, belam nedekira bilêm ew keseye ke to defterî şî`rekanî lê le tendûrî be kemiran hawîşt. Komele gowarî Awatîşî çap kird û min lewîşda nûsîm.

Tîatirî «Dayikî nîştîman» gewretirîn tebilîxatî bo Komele kird. Ew tîatire ke zorîş sakar bû û detwanim bilêm lebarî hunerî û tenanet fikirewe natewawîş bû. Sê çwar mang le Mehabad û şarekanî tirî Mukiryan leser şano mayewe. Kem kes hebû neçûbê û her kesîş çûba degirya û hestî kurdayetî debizût. Le dêhatî zor dûredestewe xelk bo dîtinî ew numayîşe dehatin. Bêcige le tebilîxatî siyasî lebarî maddîşewe dahatêkî zorî hebû û Komeley dewlemend kird.

Komele her bew dahatane twanî çapxaneyekî destî bikirê û le Mehabad daybimezirênê.

Ta ziyatir le Komeleda karim dekird piley zanyarîşim pitir deçûwe ser û le piyawî zana û edîbî wek Pêşewa Qazî Muhammed û kake Rehmanî Muhtedî nîzîktir debûmewe û şityan lê fêr debûm. Hîç kam ew piyawe gewraney kurd ke le parçekanî tirî Kurdistanewe dehatin le min şarawe nebûn. Hemze Ebdulla, Mistefa Xoşinawî şehîd û Mîrhac û Qudsîy şehîd û zorî tirim lew têkoşerane dîtin û alugorî fikirîm legel kirdin.

Çapemenîyekanî Êran pêşkewtûwanetir bûn û şitî tazeyan têda bû. Betaybetî çapemenîyekanî hîzbî Tudey Êran le rûnkirdinewey bîrûray siyasîy minda karyan kird. Rewabîtî ferhengîy Êran û Şûrewî lqî le Mehabadîş damezira. Minîş yekêk lewane bûm ke lewêda karim dekird. Herçend bedaxewe ew binke pêşnyarekanî minî cêbecê nekird û hîçî be kurdî bilaw nekirdewe, belam zor şitî benirxî be farsî bilaw dekirdewe û kelkim lê werdegirtin. Şî`r û nûsirawî kurdî be azerî û rûsî terceme dekiran û eweş deskewtêkî baş bû bo ême. Yekêk lew şitaney terceme kiran û minîş le tercemekirdinîda beşdar bûm *Alekokî hejar* bû, ke lelayen însanêkî waqî`î û şa`îrêkî başî Azerbaycanî Şûrewî, mamosta Ce`fer Xendanewe be azerî û be şî`r terceme kira.

Şerî malwêrankerî dûwem be têkişkanî faşîzim û nazîsim û şirt û gumbûnî Hîtler û kujranî Mosolînî û gîran û lenawçûnî şerhelaysênekan tewaw bû. Hîwa û humêdî gelanî jêrdest û zorlêkiraw geşey peyda kird. Leşkirî hawpeymanekan le Êran çûneder. Le halêkda ke cûlanewey rizgarîxwazîy gelanî Êran roj be roj perey degirt.

Gelî kurd yekêk bû lew gelaney ke hîway be dûwarojî geşedarî xoy dem be dem peregirtir debû.

Desteyek le rûnakkîran û endamanî Komeley «J. K» hatine ser ew birwaye ke cêbecêkirdinî bernamey Komele le helûmercî êstay cîhan û Kurdistanda îmkanî keme. Boye bernameyekî kurd û nwêyan ke legel helûmercî ew serdemîda degunca gelale kird û le rojî sêy xezelwerî 1324 (1945) yekem kongirey hîzbî Dêmokratî Kurdistan le şarî Mehabad gîra û ew bername pesindkira û rêkxirawî hîzbî Dêmokratî Kurdistan her leser binaxey rêkxirawî Komeley «J. K» damezira û tenya le kadirî raberîda alugorêk pêkhat û Pêşewa Qazî Muhammed ke endamêkî sadey Komele bû û nawî nehênîy «Bînayî» bû, be Pêşeway hîzb helbijêrdira û serokî Komele ke piyawêkî zor têkoşer û aza û pak bû le kadirî raberîda nema. Em alugore hîç karî nekird ser ew piyawe û le rîzekanî xwarewey hîzbdada dirêjey be xebat û karî xoy her da û rencêkî zorî kêşa.

Le kobûnewekanî kongireda min bo yekem car le jiyanimda le beramber xelkda şî`rim xwêndewe. Katêk berêweberî kobûnewe gutî: êsta «axay Hêmin» şî`rtan bo dexwênêtewe û min bo şî`r xwêndinewe be şermewe çûme ser mînberî Mizgewtî Sûrî Mehabad, hemû kes tenanet Pêşewaş waqî wirma û le xoyan depirsî: çon Hêmin şa`îr û nûserî Nîştîman «seyîd Muhammed Emînî şêxelîslamî» bû û ême neman denasî? Babîşim ke ewey bîstewe le gftî xoy peşîman bowe û gutî Hêmin şa`îrêkî baş nîye.

Hîzbî Dêmokratî Kurdistan korêkî be nawî «heyetî reîsey mîllî» helbijard ke minîş yekêk bûm le endamekanî. Le helbijardinî nawxoda hacî Babeşêx ke pîrtirîn endam bû, be serok û min ke lawtirîn endam bûm be sikirtêr helbijêrdirayn. Çend mang lew koreda karim kird. Karêkî giran bû. Her min betenê be karekan radegeyîştîm û hacî Babeşêxî rehmetî her ewendey leser bû ewî min deynûsim îmzay bika. Herçend lebarey destelat û nawbangewe karêkî giring bû, belam legel zewqî min rêk nedekewt. Betaybetî berê çûn legel hacî Babeşêxî xobezorgir û kellereq karêkî hasan nebû.

Lêreda ke basî hacî Babeşêx hate gorê demewê şitêkî mêjûyî rûn bikemewe. Le nûsirawî çend piyawî bêxeberda dîwme û le xelkî sakarîşim bîstûwe tawanî xeyanet webal hacî Babeşêx deden. Min hacî Babeşêxm xoş nedewîst. Çunke legel eweşda deyangut le `lûmî dînîda zor şarezaye û ryazyatî kon zor dezanê, piyawêkî zor koneperist û kellereq û xoperist û naşareza bû. Belam zor rast û pak û aza û be

bîr û bawer bû. Be hîç barêk tawanî xeyanetî pêwe nanûsê. Lekatî witûwêj legel nwêneranî dewletî merkezîda dûr nîye firîwî xwardbê û be hele çûbê. Belam le rêgay rast laynedawe.

Bilawe pêdanî gemaroy dewrî Seqiz û Serdeşt û Xurxure ke tawanekey dexene ser hacî Babeşêx pêwendî be meseleyekî qûl û nehênîy siyasîyewe heye ke lêreda cêgay baskirdin nîye û ba carê derxoney Leser dabinêyn û zor le destelatî hacî Babeşêx berejûrtir bû. Hacî Babeşêx ewendey destelat nebû fermandeyekî dewrûberî em şarane be qsey biken û bikişênewe. Xo ew hîç mesûlîyetî leşkirî nebû, leşkirî Kurdistanîş wek leşkirêkî resmî be qsey fermandekanî xoy dekird ne be qsey serekwezîrêkî bêdestelatî xeyre nîzamî. Hîwadarim bem kurte nûsîne xwênerekanim rûn kirdibêtewe.

Min wazim le sikirtêrî «heyetî reîsey mîllî» hêna û le komîsyonî tebilîxatî hîzbdada destim be kar kird. Le hemû çapemenîyekanî hîzbdada destim be nûsîn kird. Le rojnamey Kurdistan û gowarî Kurdistan û Hawarî kurd û Hawarî nîştiman û Girugalî mindalan û gowarî Helaleda şîr û witarim bilaw dekirdinewe û le mîtîngekanî hîzbdada beşdar debûm. Le desteyekda ke bo dananî kitêbî kurdî bo fêrgekanî Kurdistan karyan dekird, endam bûm. Endame eslîyekanî ew lîjne wek lebîrim mabê, Zebîhî û Hejar û Biraymî Nadîrî û Dilşadî Resulî û min bûyn. Pêşewa bo xoy û çend mamostay şarezaş yarmetîyan dedayn. Herçend hîçiman lew kareda pispor nebûyn, belam çünke zor be dilsozîyewe karman dekird pêm waye kitêbekan ke bedaxewe çap nekiran xirap nebûn.

Rojî bîst û şeşî sermawez alay Kurdistan le Mehabad helkira û rojî dûy rêbendanî 1324 komarî Kurdistan damezira. Min namewê lew barewe bidûwêm çünke zorî bas kirawe û tenya delêm min lew roje pîrozana beşdarbûm û şîrim xwêndewe.

Lew maweda min û Hejar yekimal bûyn, şew û roj pêkewe degerayn. Maweyekîş Qzilcîman legel bû. Katî bêkarî û saneweman zor xoş radebuward. Min ke payey xwêndewarî û zanyarîm zor lewan kemtir bû, le hawnîşînîy ewan kelkim werdegirt û şit fêr debûm. Çünke min û Hejar bo hemû cêgayek pêkewe bûyn û lêk helnedeberayn, zor kes neydezanî kamman Hejare û kamman Hêmin û eger yekiman betenê gerabayn deyangut kwa ewî tir?

Paş dûy rêbendan û pêkhatinî komarî Kurdistan kurdekanî parçekanî tirî Kurdistan rûyan le Mehabad kird û min û Hejar legel hemû piyawe benawbangekan pêwendîy dostayetîman damezirand. Mamosta Qanîîşim nasî û le ezimûnî edebîy ewîş kelkim wergirt. Zorim bîrewerîy xoş le hawnîşînîy mamosta Qanîî heye ke bedaxewe lêreda mecalî gêraneweyan nîye.

Dayikim lemêj bû deywîst jinim bo bênê û ta nemirdûwe min be zawayî bibînê. Belam min milim ranedekêşa û nedeçûme jêr bar. Xom be xwêndewar dezanî û pêm wa bû heq nîye dayik û babim jinim bo bênin. Bo xoşim le helbijardinî dezgîranda dirdong bûm û heta gewretir debûm ew dirdongîyem ziyadî dekird. Lew axîranada hatbûme ser ew xeyale ke eslen jin nehênim û be rebenî bimênimewe. Hîç kiçêk tebî cwanîperistî minî razî nedekird û reng bê eger dayikim nebûba êstaş buxçey nekirawe bûbam. Belam dayikim ew salî pêy lê le kewîşan kirdim û gutî: îlla bîlla, pêt xoş bê û pêt naxoş bê jinit bo dênim. Lewlaşewe Hejarî lê dine dabûm û şew û roj lebin hengilimda bû. Hejar betemen çî wa le min gewretir nebû, belam sard û gerimî rojgarî le min zor pitir çêştû. Dû carî jin hênabû û ezimûnî lew barewe zor bû. Tundî û sereroiyî dayikim û nerme nerme û dinedanî Hejar dilyan nerim kirdim.

Dayikim birazayekî xoy ke kiçî piyawêkî bedestelat û dewlemend bû bo xwastim ke ne dîbûm û ne demnasî. Diro nebê carêkî dûrbedûr leber mangadoşin dîbûm, ewîş ruxsarim nedîbû, belam demzanî kurte balaye. Eweş seyr bû min ew xowêje nebûm ke gutûyetî: «sed nehlet le haletim her îy kurtim xoş dewên» min le jinda ewî le hemû şit pitir serncim radekêşê bejin û balay rêkûpêk û berze. Eweşim be dayikim gut. Gutî: role ew qsane çin? Zêrîş biçûke. Dayikim jinêkî dinyadîde û beezimûn û karame û zor bedestelat bû. Xizm û kesukar û dost û aşinaşiman zor bûn, lenaw ew hemûwanada ew

birazayey helbijardbû. Diyare ew bedûway kiçi şox û şeng û cwan û çelengda negerabû, ew deywîst bûkêkî akar baş û reftar çak û wirya û bemşûr û maldarîkerî hebê.

Şayîy Hêmin dest pêkira, Hejar helbezî, serçopî kêşa, destî doy nasik û nazdarî guşî, çawî le kîjolan dagirt û şewaneş bew qse qoraney xoy korî dîwexanî we pêkenîn dexist. Belam Hêmin nîgeran bû, nîgeranî dûwarojî xoy û bîrî lewe dekirdewe çon legel jinêk ke helbijardey dayikîyetî û bo xoy neydîwe û naynasê, detwanê jiyar berête ser. Neydezanî toqî le`netî bo dênin ya firîştey rehma.

Rojî 25î xezelwerî 1325 bûkiyan bo dabezandim. Diyare ew perîy nasik û nazdar û şox û şeng û cwan û çelenge nebû ke xeyalî şa`îraney min beşwênîda degera û hêştas tûşî nebûwe. Belam zor zû twanî xoy le dilî minda cê bikatewe û wa le xoy bika ke le qûlayîy dilimewe xoşim bûwê û bibê be yarî hemîşeyî û xemirewênî rojanî tal û tiftî jiyanim. Bîst û sê sal pêkewe jiyayn û le pena ewda hestim be sanewe dekirde. Qetî ewende dil neşkandim rojêk ta êware lêy zîz bim û dengî lê bigorim. Zor le jiyani jinumêrdayetîm razîm. Îqrar dekem jiyani xoşî jinumêrdayetîman ziyatir ew pêkî hênabû. Çunke min dezanim hesas û tûre û tenanet biyanûgir û cîngnokem, belam ew hêdî û aram û jîr bû û biyanûy nededa destim. Taqe kurêkiman bû nawî na Selah, ewe maweyekî zore le dîdaryan bêbeşim û derdî dûrî deçêjim. Yadyan bexêr.

Hêştâ mangêk beser şewî zawayetîmda ranebirdibû û be qsey ewro mangî hengwînim tewaw nekirdibû, ke bedaxewe ewey nem dewîst rûbda rûy da û ewey pêm xoşbû bimirim û neybînîm dîtim. Rîsekeman lê bowe xurî. Hêlanekeman lê şêwa û komarekeman rûxa û dujmin besermanda zal bowe.

Maweyek bû hest be metirsî dekira. Cebhey Seqiz û Serdeşt qaymtir dekiran. Çend derebegî benawbang û xayn rayan kirdibû bo Êraq û yek dû mela û şêxî xwêryepiyaw desbeser kirabûn. Hikûmetî Azerbaycan leşkirêkî saz û teyarî bo piştîwanî pêşmerge nardbûwe cebhey Seqiz, çunke wa berawird kirabû ke tenya lew cebhera tirsî pelamarî dujmin heye. Lepêşdaş çend car lew cebhera dujmin pelamarî hênabû, belam zor xirap şikabû û zebirî destî pêşmergey Kurdistanî çêştû.

Azerbaycan hikûmetêkî gewretir û behêztir û zor teyartir û pir çektir bû le Kurdistan. Xetî dîfa`î Azerbaycanîş zor qaymtir bû. Kewabû kem kes be xeyalîda dehat le rêgay Azerbaycanewe pelamar bo ser cûlanewey rizgarîxwazî gelanî Êran bihênre.

Maweyek bû bo ewey karekanî hîzbî baştir rabipern paş ewey şewane Pêşewa ke zor şew ta direng le defterî hîzbda demawe deçowe malî xoy, kadirêkî hîzbî le defterî hîzbda demawe bo ewey raportî xwarewe eger pêwîst bû be Pêşewa rabigeyenî û desturatî Pêşewa bo xwarewe binêre. Ew şewî norey minî taze zawa bû.

Le defterî hîzb danîştûm û xerîkî nûsînî meqaleyek bûm bo «Kurdistan», efserêkî biçûk belam dostêkî gewrey min û endamêkî zor bewefay hîzb hate jûr. Zorim pê naxoş bû ke destî bo radyokey serimêzeke bird, çunke nûsînekey lê têk dedam. Belam çim negut û qelemekem dana.

Lepir şitêkî waman gwê lê bû ke wextabû pêman be erzewe wişk bê. Radyo Taran telgirafi pîrozbayî duktur Cawîd wezîrî nawxoy Azerbaycanî dexwêndewe ke beboney geranewey erteşî şahenşahî bo Taranî nardbû. Dûwaye xeberî rakirdinî «mutecasîrîn» î rageyand. Mutecasîr û «maceracû» dû naw bûn ke lew şewera beser berêweberanî cûlanewey azadîxwazî Kurdistan û Azerbaycanda biran û êştas dezgay tebilîxatî rêjîm dûpateyan dekatewe û deyanhênêtewe kawêj.

Desbecê be tîlfûn ew xeberem be Pêşewa rageyand. Gutî bo xot were êre û be ewanî tirîş rabigeyene bêne êre. Bedûway ewanimda nard û boxom çûm bo malî Pêşewa.

Sedirî Qazî biray Pêşewa ke nwênerî mecilîs bû le Taran û be rwalet nedebû lew waqî'e bitirsê, le hemû kes pitir şilejabû. Ew desbecê gerawe bo Taran û lewê girtyan û hênayanewe Mehabad.

Azerbaycanî wa teyar û pir çek be leşkirî saz û perdax û fermande lêzanekaniyewe bo wa zû teslîm bû? Pîşewerî karamê û şorişgêr û konepiyaw û aza û raberekanî tirî Azerbaycan bo wa be pele rayan kird? Pirsyarêke kes be tewawî cwabî nedawetewe û minîş cwabim bo nadirêtewe. Belam dilnyam eger fidayî destî kirdibawe û eger firiqe berberekanî bikirdaye, leşkirî şiruşiprêwî Taran ne tenya pêy le Tewrêz nedena û ew hemû kuştarey nedekird, belke Taraniş deşêwa û lewanebû le sertaserî Êranda cûlanewey azadîxwazî beser koneperistîda serkewê û tenanet nfûzî împiryalîzim le rojhelatî nawerastda zûtir binebirbê. Belam wek zanayan gutûyane mêjû eweye rû deda nek ewe ke ême demanewê.

Belê kutupir Tewrêz gîrawe û Kurdistanîş le hemû lawe gemaro dira. Paş ewey Sedrî Qazî nazanim bo çî berew Taran gerayewe raberanî hîzbî Dêmokratî Kurdistan le malî Pêşewa kobûnewe û ew şewî rûhyey hemû kes detwanim bilêm baş bû. Şuray ceng be serokayeti hacî Babeşêx pêk hat û suretcelsey yekem îmza kira û qerarî berberekanî dira. Belam hêştâ merekebî biryarnameke wişk nebibowe ke xeber hat yekêk le endamekanî ew şuraye ray kirdûwe.

Bo beyanî wez` gora û biryarî berberekanî helweşawe û be pêşmerge destûr dira bê destkirdinewe paşekîşe bika û rêga bo erteş betal bika û xelk destêkî kewte ewlay û yekêkî kewte emilay.

Pêşmerge le cebhey Seqiz û Serdeştewe be rêkûpêkî pakîşey kird. Belam fîdayîyekan ke fermandekanyan rayan kirdibû wek merî bê şwan bilawbûn û eşayir lêyan wexokewtin û hemûyan daploşin û neyanhêşt taqe fişekêk legel xoyan bernewe. Belam newêrane pêşmerge. Tenya lenaw Menguran pêşî desteyekîyan girt ke be fermandeyî zêroy degerawe, zêroş ke bo xoy şirexorêkî wek ewan bû, destî neda û begijiyanda hatewe û tenanet çend gundîşî talan kird û geştişewe Mehabad. Ewanî fîdayîyekanî Azerbaycanyan rût kird kesyan nekuşt. Ewî min webîrim bê lew karesateda tenya pêşmergeyekî kurdî Êraq şehîd kira û hêndêkîşyan napiyawane rût kirdin.

Fermandey erteş bê hiç zehmet geştişewe gundî Hemamyan û Pêşewa lewê dîtî.

Lew maweda min hemîşe legel Pêşewa bûm. Diyare legelî neçûme Hemamyan, belam le şarî becêm nehêşt. Demdît peşokabû, belam nek le tirsan, belke le daxan û leber nahumêdî.

Min le mêj bû Pêşewam denasî û le rojî tenganeda dîbûm. Be dest û tifengî xoy piyawêkî zor aza bû. Pêş damezirandinî komarî Kurdistan çend car eşayir hatine ser Mehabad û Pêşewa boxoy le yekem sengerda bo dîfa` amadebû. Edî çon bû ewcar teslîm bû? Boxom lêm bîst gutî lesermanewe naçin û demankujin, belam pêm xoş nîye gelekem becê bêlim û demewê lenaw ewanda bimirim.

Raste Kurdistan paş gîranewey Azerbaycan û ledestdanî ew hawpeymane behêze le hemû layekewe gemaro dirabû, raste beşêkî eşayir gwêyan le kilaw perandbû û çawenorî xirapeyan lê dekira, raste xezêney komar betal û hetal bû û hemûy dirabû be tûtin û hêştâ nefiroşirabowe û le embarda mabowe, raste le hemû yarmetîyekî derewe hîwabiraw kirabû, belam min beş be halî xom lew birwayedam eger destewekerî kiraba û ême ezimûnî şorişgêrîman heba mêjûy komarî Mehabad bew core dûwayî nedehat ke hat.

Rojî 26-î sermawezî 1325-1946 erteşî şiruşiprêwî şahenşahî tewaw salewextêk paş helkirdinî alay Kurdistan şarî Mehabadî girtewe.

Hêndêk le berêweberan û kadirekanî hîzb rayan kird û xoyan şardewe û hêndêkîş danîştin û çawenorî girtin bûn. Min ew rojî le şar wederkewtim û çûme xaneqay şêxî Burhan. Lewê şêx Muhemmedî xalim



heşarî dam û lebin balî xoy girtim. Le xaneqa bûm ke xeberî gîranî Pêşewa û raberanî hîzb û komarim bîst. Piyawim wedûy Hejar xist bîbînimewe û pêkewe tegbîrêk bikeyn. Ewîş boy derçûbû û bom nedozirawe.

Nexoşî kewtûyî le xaneqa hebû, zor kes girtibûy û çend kesîşî kuştû. Min carêkî tir her lew xaneqaye ew nexoşiyem girtibû û zorî lê detirsam. Gutûyane herçî bitirsê naxelsê, hênde pê neçû girtim û kewtim. Befirêkî yekcar zor û estûr kewtbû, hîç duktorêk bew befire nedegeyişte xaneqa. Dû mangî rebeq boy leser reqî piştî kewtim. Espek leserî dam û qsey hateran pateranim dekird. Hemû bendenim be nwênanewe çû û twêxî hawîşt. Belam ewcarîş le dest Îzraîl rizgarîm hat.

Ke le nexoşî hestamewe befirîş kem bibû, rêga kirabûnewe. Wayan be meslehet zanî bo ewey kemêk jîwele bibimewe û gurd bigirmewe be dizî biçimewe malî xoman ke le şar nîzîk bû û derman û xwardinî baştirî lê wedest dekewt. Çak lebirim nîye çend rojan le malêda temalim helgirt û xom melas da.

Rojêk le jûrê danîştûm û kitêbim dexwêndewe, lepir lenaw dêda bû be şîn û gabor. Nardim bizanim çîye. Qasîd be giryan û lexodan hatewe û gutî ewaney le şarî hatûnewe delên dewrî şar gîrawe û nayelin kes biçête naw şar ya wederkewê û dengoye û delên Pêşewa şehîd kirawe. Hêndey pê neçû qseke dira û me'ûm bû Pêşewa û Sedrî Qazî biray û Seyfî Qazî amozay le çwarçira ledar dirawin. Ew rûdawe diltezêne û ew karesate cergbire hemû kurdêkî beşerefî xeminak û tazyebare kird. Betaybetî dilî minî be nator engawt. Natorêk ke bote tîrawê û êstaş her webin dedatewe û heldedatewe û bêguman sarêj nabê û legelim dête bin gil.

Min Pêşewam le dilewe xoş dewîst. Be raberêkî dilsoz û jîrim dezanî, be kurdêkî pak û çakim denasî û be muslîhêkî yekcar gewre û mezinim dezanî. Demzanî netewekey xoy çend xoş dewê û çendî pê xoş xizmetî bika. Çend be awatewe bû kurd bigate rîzî netewe bextewerekan. Zorim hîwa pê bû gelekeman be pele berête pêş û wilatekeman zû awedan bikatewe. Lew mawe kurteşda dezanî çendî xizmetî bekelk kirdin. Berastî mergî Pêşewa nek her bo netewey kurd belke bo cûlanewey azadîxwazî û dijî împiryalîstî seranserî Êran ziyaneke gewre bû. Deryayek zanist û edeb, deryayek fikir û bîr, bedestî zordarekî serero û nezan wişk kira û lenawçû.

Sê roj paş şehîdbûnî Pêşewa yanî rojî sêzdebeder qelfirim bo kird û legel piyawêkî hejar û hawalêkî zor benirxî hîzbî berew Kurdistanî Êraq werê kewtîn. Be dû roj û danêk sinûrman perand. Lewberî cogewe bazim da ewberî coge be rwalet hîç feriqêkim nehate pêş çaw. Belam le waqî da sinûrî siyasî wilatêkim perandbû û çûbûme wilatêkî dîke. Geyîştîme şarî Qeladize, wenêw bazar kewtim û nekewtim be berg û lîbas polîs nasîmî û zanî lew dîwra hatûm. Pîlyan girtim û xerîk bûn têkimewe pêçin. Belam melayek û hacîyek bê ewey bimnasin balyan beserda kêşam û necatyan dam. Neqleke rast le min rûy dabû le tirsî agir penam bo mar birdibû. Mela pêy xoş bû bimnasê. Minîş legel eweşda pêm xoş nebû kes bimnasê û nawî xom be kes bilêm xom pê nasand. Diyarbû mamosta minî le dûrewe denasî. Ew şewey zorî hurmet girtim û le hucrey feqêyan nûstim û beyanî boxoy wepêşim kewt û birdimî bo gundî Girdbudax. Min be hîwa bûm soraxî Hejar û Zebîhî û Qzilcî û Dilşad bikem û qsey xoman bê le dilî xomda wam danabû yek bigirînewe û serlenwê destbekar bînewe. Diyare ew qsem be mamosta eriz nekirdibû, belam pêm gut demewê awalekanim bibînimewe. Mamosta gutî carê rûbar zorin û buwar nîn û bêcige lewe ew kurdaney êre ke hatbûne Êran hatûnewe û dangerîze dekenewe bo lay şaran û polîs amadeyî heye. Carê maweyek lêre be ta wilat kemêk aram debêtewe. Hawrêyekem nardewe û bo xom destim kird be xwêndin û serlenwê bûmewe feqê. Zor çakim dexwênd. Hem xom dexafiland û werezî xom deşkand û hem demwîst ewî le sûrîm dorandûwe le kayey tê helbînimewe. Hêştalaw bûm û eger xwêndbam demtwanî şitêk be şitêk bikem. Belam xwêndinekem zorî nexayand.

Bîstim wezî Êran aram botewe û destyan le xelk girtin helgirtûwe û lêkim dawê paş ewey lêreş her qaçaxm û nawêrim bigerêm bo serêk le wilatî xoman nedemewe? Eger zanîm dehawêmwewe ewe her lewê xom heşar dedem. Be taqî tenê rûm le kwêstane xoşekanî Kurdistan kird be nêw çadir û hobe û gul û gulzaranda geram. Şengebêrî kêl gerdinim dîn. Lew geşt û geraneda bûm ke parçe şî rî Beharî Kurdistanim gut, ke boxom êstaş zorim xoşdewê û be şakarî dezanim. Jandarim û polîs le hîç kwê tûş nebûm û bê sedeme geyîstîmwewe gundekey xoman. Rawestam ta şew beser destanda hat û be tarîkî çûme malê. Yekser çûme pişt derkî jûrî babim. Bo yekem car le jiyanimda xom girt. Çunke babim xo le xelk girtin û gwê le qsey xelk helxistinî zor pê naxoş bû. Tenanet jinî malî ême le tirsî babim qet neyan dewêra şemole bigirinewe ke ewdem le ladêda zor baw bû. Le dirzî derkewe dîtîm babim be hewawe rawestawe û legel ew piyawey ke legelim hatbû bo Kurdistanî Êraq qse deka û pêy delê role pê m bilê le kwêye boxom piyaw denêrim. Ewîş delê dû rojî dî boxom deçim û deyhênimewe. Qewlim pêdawe cêga û şwênî ew be kes nelêm. Babim kemêk be tûreyîyewe gutî çon be minîş nalêy? Gutî nexêr be toş nalêm. Be dayikîşî nalêm, qewlim pêdawe û qewlî xom debeme ser. Mandûyî rêga û kwêrewerî xerîbî û lê qewmawîm lebîr çowe û le dilî xomda gutim çon zehmetkêşanî kurd kurî wayan lê peyda bûwe?

Belê zor qaremanî wa le xebatî rizgarîxwazî gelekemanda hen ke be şerefewe jiyawin û be şerefewe demirin û mêjûş lebîryan deka. Ew piyawey, piyawêkî hejar û zehmetkêş û nexwêndewar bû. Le seretay Komelewe be birwayekî qaym û tewawewe hatbûwe naw korî xebat û bê ewey xoy ranê xizmetî zor gewrey kirdibûn û kesîş başî nanasê û minîş lêreda nawêrim nawî berim. Çunke nazanim mawe ya nemawe û deşzanim eger mabê tûşî derdîser debê.

Çîdî xom pê ranegîra û çûme jûrê. Dayikim û babim û kabira waqyan wirma. Dayikim ambazim bû û têrupirî maç kirdim. Belam babim ew babey ke qet rûy nededamê û leber hîç karesatêk nedeçoma û bemetanet û xoragirî le wilatda nawbangî hebû û heta ma yekiman cigereyan lekin nekêşa û bê îcaze danenîştîn, xoy pê ranegîra û be lûze û firimêskî le çaw hate xwar û heta maweyek hîç qsey bo nekira. Dûwaye bo yekem car û axir car le jiyanimda bexêrhatinî kirdim û gutî çak bû hatyewe. Ewe le dûwam denardî efwî `mumî bo eşîretan derçûwe. Raste ême eşîret nîn, belam xelkî gundîn û detwanîn lew derfete kelk wergirîn. Malî dinyam zore û êsta hemû şit be bertîl dekirê. Carê maweyek le malê danîşe û hatûçoy şarûbaran meke ta bizanîn dinya çî lê dê.

Le malê danîştîm û çî bas nebû wirde wirde xelkiyan berda. Minîş destim kirdewe be cût û ga û ajeldarîyeyek xom û hatimewe ser hûllnemesê.

Hîzbî Tudey Êran be aşkirayî xebatî dekird û roj be roj komelanî xelkî Êranî ziyatir lê ko debûnewe. Le rojnamekanî xoyda împiryalîzim û koneperistî be tundî dekuta û tîorîy zanistî bilaw dekirdewe.

Hîzbî Dêmoqrati Kurdistanîş kem kem bûjawe û kadire lawekanî destyan kirdewe be xebat. Piyaw heq bilê hîzbî Tude lew serdemeda le bûjandinewey hîzbda rolêkî başî yarî kird. Tenanet le parastinî nawî hîzbda. Çunke hêndêk le lawe azadîxwaz û kem ezimûnekan xerik bûn nawî hîzb bigorin û bîkene Komeley Komonîstî Kurdistan û wek bîstûme berêweberanî hîzbî Tude manî bûn.

Jimareyek Nîştîman bilaw bowe û geyîşte destim û humêdim peydakird ke xebatekeman pere bigirêtewe. Herçend raportyan lê dam ke le nûsînî em gowareda destim heye û birêkiyan ember ewber pêkirdim û bexway destêkîşyan be yal û bijîda hênam û pul çayekiyan lê estandim. Belam ewe çû û rabird nemzanî le kwê çap kira û her be şêwenûsîn nûserekanim nasîn.

Jimareyekîş rêga derçû û pê m geyîşt. Yekêk le nûserekanim dît û belênî hawkarîm pêda, belam bedaxewe ewîş têdaçû.

Le rojî 15-î rêbendanî 1327 Nasirî Fexrarayî le danîşgay Taran şay weber demançan da tozkalêkî dem û lêw û pişt rûşand. Ew tawaneyan hawêşte ser hîzbî Tude û îcazey resmî karkirdinî ew hîzbeyan helweşandewe û raberekanyan girtin û derkî rojnamekanyan daxistin û le sertaserî Êranda hikûmetî nîzami damezira. Eweş zebirêk bû ke be nexşey împiryalizim û be destî koneperistî we cûlanewey rizgarîxwazî Êran kewt.

Belam zorî pê neçû rojnamekanî hîzbî Tude be nihênî derçûnewe û raberanî hîzb twanîyan le zîndan rabiken.

Seyr ewe bû paş rûxanî komarî Mehabad min bo yekem car dû roj pêş waqî`ey danîşga wêrabûm be aşkirayî biçime Mehabad û be rojî rûnak bigerêm ke ew rûdawe le Taran qewma û le Mehabadîş destyan kirdewe be xelk girtin. Naçar minîş xom şardewe. Lew xoşardîneweda şî`rêkî zor başim lejêr înwani «Jwanî axa» da gut ke be daxewe xom nemmawe û tika lew kesane dekem ke heyane bîparêzin û eger kira bom binêrin.

Salî 1327 salêkî yekcar tûş û şûm bû. Min be umirî xom zistanî wa sextim le wilatî xoman nedîbû. Pazde rojî payz mabû befirêkî estûr û wişk barî. Yek nwa le hemû cêgayek le mîtirêk pitir bû. Wişkebend û serma û sayîqey bedûwada hat û yekser bû be rû, befirî dîkeşî beserda barîn, rêuban gîran, qatuqrî peyda bû, aw wişk bûn û xelk naçar bû befir bitwênêtewe û bîxwatewe. Newt û awirdû wegîr nedekewt. Ajel û malat qranî kird. Repiste rzîn û newende ginxan û giraniyekî zor besamî bedûwada hat.

Min boxom le ezimûnî piyawêkî dinyadîde û konsal kelkim wergirt û twanîm beşêkî zor le dexludanî xoman le rzîn û zayebûn rizgar bikem.

Behar direng bû, hewa gerim bibû. Belam befir areqîşî nedekird. Rojêk çûme mizgewt temaşam kird pîrepiyawêk betenê le tenîşt sobe sard û sireke helkurmawe. Her minî dît gutî: mindalî ew zemanê emeyan pê xerfawe. Gutim mamegiyan çi qewmawe? Gutî: beserî to ewe çend roje bew hetîwe gêjaney xom delêm biçin befirî ser repistekeman kunkun biken gwêşim nadenê. Gutim ca bo kunkunî biken? Gutî bo toş nazanî? Gutim newella. Gutî bîlamanê ke sal direng bû herd gerim dadê û helimê deka, befirîş nayelê helimeke bêteder û lenaw xoyda degerêtewe û dexleke desûtê. Eger kun bikirê helimekey dêteder û nasûtê. Qsey mamepîrem bedilyewe nûsa, çend rojan piyawim helgirtin û çûme zik befir kunkirdin belam kareke zor giran bû. Befireke ewende req bû be lose kun nedekira. Belam paşan têgeyîştim pendî pêşînyan çend raste ke gutûyane «destî mandû Leser zigî têre».

Beşî zorî dexlî ême ew salî nerzî û nan û towî xoman bû.

Ew salî le hîç kwê dexlî nebû. Ew cûtbendaney zewîy awîjeyan bedestewe bû, herzin û genimeşamîyan çand û nîwenanyan peyda kird. Minîş herzin û genimeşamî zorim çand û berhemêkî başyan da. Belam le gundekeman hîç dahatiman wegîr nekewt, çunke boxoyan hîçyan nebû ta beşî ême biden.

Bo zistanî dahatû giraniyekî besam seranserî Êran betaybetî Kurdistan û Azerbaycanî dagirt. Dexlî firoştin her nebû, heşba le kirîn nedehat. Hîç şitî tirîş dirawî nedekird. Dû merî daştî pûte genimêkî nedekird. Kewîje genimêkiyan be cûtêk kelî xawê nededa. Hawarî serûmal bû, bira awrî weser bira nededa. Belam min nemdî û nembîst le Kurdistan kes rastewxo le bîrsan bimirê, herzin û genimeşamî xowlatî û genim û co û xurmay Êraq hoyan dawe.

Legel eweşda dezgay tebilîxatî padşayetî Êran lew salaneda şew û roj û wext û bê wext pelamarî debirde ser dewletî Şûrewî, ew dewlete wek cîranêkî baş û dilsoz genimêkî zorî da be Êran. Ewîş çi genimêk be ruhî piyawî pêdekenî. Be hatinî ew genime xeter kem bowe û qatuqrî le şaran nema.

Dewlet le dabeşkirdinî ew genimeda dêhatîşî lebîr nekirdibû û le rûy şunasname mîqdarêkî genim bo her xêzanêk danabû. Belam debû axa be qerzî serxerman werî bigirê û sened bida, ca beser xelkî gundekeda dabeşî bika. Axakan genimekeyan be ziyadewe wergirt û wek piyawî çak lepêş çawî karbedestanî dewlet be sût û selemxorekanî şaryan firoşt û dirawekeyan nexd û puxt le tenkey gîrfan qaym kird. Ewan engiran, sûtxorî şar qazancyan kird, simêlî piyawî dewlet çewir kira û ewî lew naweda hîçî pê nebira hejar û nedarî ladê bû.

Le beharda xelkî dêhatî Azerbaycan le halêkda ke wek xezelî payz lebirsan heldewerîn û piyaw agirî bo tê berdebûn be Kurdistan werbûn. Gelî kurd carêkî dîkeş piyawetî û nan bideyî û mîwandarî xoy nîşan da.

Her desteyek rûy le her awedanîyek dekird, xelkî ew awedanîye bepîryanewe deçûn û jemêkiyan têr dekirdin û berêyan dekirdin. Zor malî wa hebûn ew jeme bo xoyan hîçyan nedexward û deyan da bew mîwane reşurût û birsî û xurênane. Jaj û penîr û lork taybetî ewan bû. Malî zor leçer û pîske neba ew salî rizqî bo negîra.

Eger gelî kurd boxoy le wez`êkî wada nebû bitwanê mîwanekanî xoy baş bexêw bika, ke behar kamil bû nîştimanekey, Kurdistanî rengîn û bijwên baweşî dayikaney bo ew birsî û reşurûtane, bo ew lawaz û lecerane, bo ew lêqewmaw û derbederane kirdewe. Le niwale zenwîrekanîda sifrey nî`metî behelz û mendok û bîza û karg û kurade û ziremendî û sîwelûke û wênce kêwîlke û kengir û rêwas û espink û alekok û dorî û tirşoke bo razandinewe.

Belê dîtîm le çerxî bîstemda, lew çerxeda ke însan etomî şikand, radarî dirust kird, tenanet mangî dagîr kird, însanîş wek ajel û wilsat le kêw û kej bilewerê. Demdîtin be giyaxwardin bayan dekird. Belam nedemirdin.

Ew mêgele şpirze û sergerdan û bê şwane be çiya serkeşekanî Kurdistanî Êranda helkişa û gilokî ew giyayaney helpisand û xoy pê têr kird û şorbowe bo girmesêrî Kurdistanî pir xêr û bereketî Êraq û wirde wirde dangerêzey kird ta beser xêr û xoşyanda kewt. Lewê kewte fer`ane. Dexludan ferîke bibû, xanexwêş her kurd bû, bedil bû, bebezeyî bû, însan bû û dilsozane mîwandarî kird û bexêwî kird.

Min le mawey ew giranîyeda piyawetî ewtom be piyawî nedar û zehmetkêşewe dîtîm ke berastî mayey şanazî însanîyet bûn. Belam bedaxewe karesatî zor diltezên û dîmenî zor dizêwîşim dîtîm. Min be çawî xom dîtîm însan lebirsan mird. Min însanim dît leber muhtacî xerîk bû nûrî çawî xoy be ard sewda bika û herweha zor heywanî dûpêy wam dîtîm be rwalet însan bûn keçî lew wez`e nalebare bo axinînî gîrfan ya damirkandinî hewesî xoyan kelkiyan wergirt.

Rojêk lebin dîwarêkî xwarûxêç xom leber beroçke helxistbû û çîlkem le herdî dewejand, hêştaxakelêwe bû wilat nexemilî bû. Bîrim le halî ew xelke hejare dekirdewe, çend mindalî dê hatine lam yekiyan gutî: filanekes xerîke jin bênê. Ew filane kese pîrepiyawêkî dilreş û konegizîrêkî bedfer bû. Kes kiçî nededaye û bê jin mabowe. Pêkenîm û gutim: ay lew diroye! Mindal têkra wecwab hatin, be pelepel û swênd û quran xwardin gutyan diro nakeyn. Ewe xerîke kiçî ew kabira heceme bikirê û le xoy mare bika. Maşalla cwanîşe.

- çî, çî, bîkirê?!

- belê, belê, bîkirê û le xoy mare bika.

Wek fişek le cêy xom derperîm û mindal kewtine şwênim. Ke çûme hewişey kabira, dîtîm boxoy leser kursîyek danîştûwe û laqî hawêştote ser laq û herwa bizey simêlanî dê. Pîrepiyawêkî kelet û teje û

wişk û req, belam be darûbar lebin dîwar heltirûşkawe û çwar mindalî reşurût û kiz û lecer le dewrûberî kewtûn. Kiçêkî balaberiz û esimer û çaw û biro cwan, belam lerulawazîş palî wekolekey bêlake dawê. Çarereşî û negbet lew dîmene debarî.

- ha kwêxa ewe çîye?

- qurban çit lê weşarim ew kiçem lew pîremeşedîye kirîwe.

- kirîwte? Be çend?

Wella qurban be giran, be pûtêk ard. (zerdexeneyekîşî bo kird).

Agirim le cerg berbû, mçurkêkim leberî pêwe hat û le toqî serim derçû, berî çawim tarîk bû xerîk bûm begij ew piyawe dilreşeda bêm, belam pîşim xwardewe, xom ragirt û le meşedîm pirsî: ew kiçe bo defiroşî? Milî belawe na, henasêkî sardî helkêşa, awî le çawî gera û gutî: dayikî dû roj pêş le bîrsan mird, boxoşî keneft bûwe û her bîna silar bowe. Destî bo lay mindalekan radaşt û gutî: ewaneş bîrsîn. Boyey defiroşim ta boxoy lebîrsan nemirê û ewaneş bijêwî çend rojêkiyan hebê. Serbeser be zêrim nededa û êsta be ardî defiroşim.

Le kiçekem pirsî: to bew kare razî? Mêrd bew kabiraye dekey? Fîrimêskî be çawe cwanekanda hate xwar, be şermewe gutî: «nînim uşaqar açdilar» - çî bikem mindalekan bîrsîn - gutim eger xêromendêk ewende ard bida be bawikit hêştaz hazîrî mêrd bew kabira pîre bikey? Be bêzarîyewe gutî: «yux wella» - ne be Xuda.

Lew keyn û beyneda jin û mindalî awedanî aporeyan le dewrî min dabû. Le qsekaniman nedegeyîştin. Neqlekem leserra bo gêranewe, jinekan têkra gutyan: eyero, çî xêr bû kafiristanîye? Gizîre pîreyan tifbaran kird û hemûyan bexar çûnewe malî xoyan. Însanîyet geyîşte ewperî, dewlemend û hejar kes bedestî betal negerawe. Heryeke le qeder xoyan, nan, kulêre, ardî genim, co, genimeşamî, herzin, maş, nok, nîsk, tenanet birînc û ron û cilke konyan legel xoyan hênabû.

Zigî mindalekanyan têr kird û tûrekey meşedîyan axinî. Ew wexte min le xoşyan giryam ke dîm mindale qoşmekanî dê ke leser dû şayî mîşên û cgên û şêruxet serî yektirîyan deşkand, be pelepel û helehel zarkî kîşe perokanyan dekirdewe û herçî qerepûlî heyانبû le mistî pîre meşedîyan dekird û boxoyan mafngî demanewe.

Hestî însanî ew kîje kurdane awatî şeytanîy ew dêwezime bilewezey kirde bilqî ser aw ke qrimî lew kiçole bêderetane xoş kirdibû. Barbûy ew însane sakar û pakane çend ewendey ew nirxe bû ke ew gurge pîre deywîst ew berxole bê azarey pê bikirê. Çend dilxoş bûm ke be hemûwan nemanhêşt le gunde xunçîlanekemanda însan be ard sewda bikirê.

Tengane beryan kurte. Giranî dûwayî hat. Qatuqrî tewaw bû. Xelk kewtewe ser karûkasbî. Belam zor kes lebîrsan mirdin, zor piyaw le piyawetî kewtin, zor mal le mal bûn, zor kes leser sacîelî danîştin û zor nakes pêgeyîştin. Zor gîrfan axindiran. Zor koşk qut bûnewe û zor mafûre raxiran û zor maşên kirdiran.

Le wilatêkî bê serewbereda, le rêjîmêkî konî derebegayetîda hemîşe belay tebî`et zulim û zor û xirape û dizî û desdirêjîy piyawxirapanîşî legele.

Ew rûdawe naxoşe zorî kar kirde ser hestî nasik û şa`îraney min û herweha zorîşî te`sîr kirde ser wez`î abûrî û komelayetî û tenanet siyasî Kurdewarî.

Wezî xirapî abûrî û komelayetî û siyasîy wilat û nedarî û destkurtîy zorbey xelk û zordarî karbedestanî dewlet û tawan û xeyanetî çînî destelatdar bû be hoy raperînêkî fikirîy bêwêney zehmetkêşanî Kurdistan û hest be mesûlyetkirdinî rûnakbîranî şorişgêr û lexoburdûy netewekeman.

Ew raperîne fikirîye û ew hest be mesûlyetkirdine bûn behoy ewe ke çînî çewsawe û twêjî rûnakbîrî kurd zor le caran bebirwatir û amadetir le dewrûberî hîzbî Dêmokratî Kurdistan ko bibinewe. Paş rûxanî komarî Mehabad qet wek salekanî 29 û 30 û 31 û 32 helûmerci lebarî eynî û zeynî bo xebatî rizgarîxwazaney gelî kurd le Kurdistanî Êran helnekewtûwe.

Herçend lew salaneda hîzbî Dêmokratî Kurdistan lejêr teşîrî hîzbî Tudey Êranda bû û ewende berew xebatî çîneyetî deroyîşt ke le xebatî netewayetîda kemterxemî denwand û ewende bo rûxandinî koneperistî û damezirandinî dêmokratî le Êranda tê dekoşa ke estandinî mafe rewakanî gelî kurdî le piley dûwem dadena, belam dîsan be piştîwanî çîn û twêje çewsawekanî gelî kurd pişt estûr bû.

Min herçend bepêy twanay xom lew xebateda beşdar bûm, belam leber nebûnî çapemenî kurdî nemtwanî hunerekem wek pêwîste le rêgay xizmetî gelekemda lekar bênim. Lewkateda ke rojnamekanî farsî be nehênî bilaw debûnewe û polîs neydetwanî biyan dozêtewe, bêguman deşkira çapemenî kurdî bilaw bêtewe, belam berêweberanî ew serdemî hîzb leber bêezimûnî eweyan belawe girîng nebû.

Ewdemîş birwam wabû û êstaş her Leser ew birwayem ke debê zehmetkêşanî kurd be zimanî xoyan bidûwênîn û debê rûnakbîranî kurd be zimanî sakartirîn însanî kurd mesaylî siyasî û komelayetî binûsin û komelanî gelekeyan rênwênî biken. Berastî hem lebarî xizmetkirdin be ziman û edebî kurdî û hem le barî rûnakkirdinewey bîrûray siyasî çîne çewsawekanî Kurdistan helêkî gewreman ledest da.

Hîzb û rêkxirawe siyasîyekanî Êran betaybetî hîzbî Tudey Êran û cebhey mîllî û piyawe azadîxwaze serbexoyekan xebatêkî rêkupêkiyan dest pêkirdibû. Rojnamekan heqayqyan rûn dekirdewe û tawanekanî rêjîm û gendelfêlî împiryalîzimyan aşkira dekirde. Koneperistî le mêjîney Êran roj be roj paşekîşey dekirde û sengerekanî lê destêndiran. Dewletekanî destkirdî împiryalîzim û nwênerî koneperistî xoyan nedegirt û yek be dûy yekda derûxan. Rezim Ara efsêrî behêz û bedestelatî erteşî Êran wek axirîn tîrî terkeşî koneperistî hate ser kar. Belam bêguman eger neşkujraba neydetwanî berî lafawî betewjimî xebatî azadîxwazan bigirê û qazancî şîrketî newtî biparêzê û destelatî derbarî koneperistî û ser be împiryalîzim bînetewe ser deqî caran û ewîş her têda deçû û mêjûş rêgay xoy her debirî.

Xebatî şêlgîr û bêwçanî gelanî Êran nîştimanperwerî benawbang duktur Musedîqî hêna ser kar. Ew piyawe becerg û nebeze xebatî gelanî Êranî jîrane raberî kird û tund begij împiryalîzimda çû. Sengerekanî yek yek pê betal kird ta be carêkî piştî şikand û newtî Êranî mîllî kird û destelatî şûmî şîrketî newtî îngilîsî lenaw bird ke lemêjsal bû wek dewletêkî giçke û behêz lenaw dewletî bêhêzî Êranda regî dakutabû.

Be birway şexsî min ew piyawe mezine heleyekî mêjûyî kird, ewîş ewe bû ewendey begij dujminî dereweda çû begij dujminî nawxoda neçû. Ew kesey le rojî 30-î pûşperî 1331-da ew fîdakarî û giyanbazî û piştîwanîyey le gelanî Êran dîbû nedebû beser koneperistîyewe biçê û debû regurîşey derbihênê. Koneperistî le hemû şwênêkî cîhanda bo parastinî destelatî xoy dest le hîç tawanêk nagêrêtewe. Boye debê azadîxwazanîş le derfetî ewtoda destî lê neparêzin. Deytwanî her le rojekanî paş 30 pûşperî 1331-da şwênewarî koneperistî le Êranda nehêlê û ewendey bêhêz bika ke netwanê rast bêtewe û serlenwê wek dardestî împiryalîzim bêtewe ser kar.

Bedirêjayî hikûmetî duktur Musedîq koneperistî le Êranda berew kemhêzî deçû û le hêndêk cêgada tewaw bêdestelat bibû. Belam bedaxewe le Kurdistanda herçend hêz û gurî caranî nebû hêştâ betewawî lê nekewtbû.

Erteş be piştîwanî derebegekanî xowlatî zorcar berengarî xebatî gelî kurd debû û zebirî lê deweşand.

Cûtyarekanî Kurdistanî Êran le salî 1331-1952-da le dijî zulim û zor û çewsandinewey derebegekan raperîn û bo yekem car le mêjûy Kurdistanî Êranda natebayî çîneyetî geyişte radey teqînewe û çînî çewsawey wilatekeman bo maweyekî kurd le beşêkî Kurdistanda twanî beser çînî destelatlarda zal bê.

Cûtyarekan her behêzî xoyan twanyan le berî Feyzullabegîyan û çomî Bokan û çomî Mecîdxan û Şamat û beşêkî Mihâl bê xwênrêjî û azardan û xirape legel kirdin axakan le gundan derbiken û be xawuxêzanewe le şarî bokanyan pestêwin û lewêşda gemaroyan biden û be pele xerîkî çekdarbûn bin.

Bêguman eger lew serdemeda raberayetî hîzbî Dêmoqrati Kurdistan diroşimî xebatî çekdaraney helbigirtibaye û ezimûnî şorişgêraney hebaye û cilewî ew raperîney bedestewe girtibaye û çîn û twêjekanî dîkey bo yarmetî û piştîwanî cûtyaran han dabaye, ew raperîne zor zû debû be nawendî şoriş. Şorişêkî resen û berîn, şorişêkî seranserî Kurdistan û lewanebû zor zû bitwanê mafe rewakanî gelî kurd le çwarçêwey Êranêkî dêmokratda biçespênê û cûtyaranî Kurdistan rizgar bika. Daxî giranim ew hele lebare û ew derfete başe kelkî lê wernegîra. Bêezimûnî xoman pitir le hemû hoyek şorişî Kurdistanî Êranî wedûwa xist. Çîn û twêjekanî dîkey Kurdistan yarmetî raperîni cûtyaranî Kurdistanyan neda û destyan Leser dest dana.

Sertîp Muzeferî fermandey tîpî Mehabad be supa û leşkir û tank û topewe be hawarî derebegekanewe çû û raperîni cûtyaran û werzêranî zor bêrehmane û be tundî serkut kird.

Derebegekanî Feyzullabegî û Dêbukrî be piştîwanî erteş û yarmetî quleaxakanî Mihâl û Şarwêran le werzêran wexokewtin. Lêyan dan, deryan kirdin, talanyan kirdin û kuştyanin û laşey deyan werzêrî şorişgêr û têkoşeryan be çomî Bokan dada.

Hikûmetî nîştimanîy Musedîq neytwanî pêşî ew tawan û cîneyete aşkiraye bigirê. Hîzbî Tudey Êran bew hemû hêzey ke ew serdemî heybû neytwanî ew raperîne biparêzê û biçûktirîn yarmetî pê bigeyenê.

Carêkî tir be çawî xom têşkanî resentirîn raperîni gelekem dî. Eger gutim resentirîn raperîni pê m waye be hele neçûm, çunke ew raperîne lenaw zehmetkêştirîn çînekanî xelkî Kurdewarî û lexowe helqulî bû. Yek dû kes nebê nwênerî hiç çîn û twêjêkî Kurdistan tenanet wirde borjwazîşyan legel nebû. Raste beşî zorî ew werzêrane endamî bewefay hîzbî Dêmoqrati Kurdistan û dostî beîmanî hîzbî Tudey Êran bûn, belam bedaxewe raberayetî hîzbî Dêmoqrati Kurdistan direng cûlayewe û neytwanî ew raperîne resene beçakî berêweberê. Bêguman eger ew raperîne baş raberî kiraba lew kateda ke koneperistî lewperî bê hêzîda bû zor zû deytwanî hemû Kurdistan bitenêtewe û bibête seretay şorişêk ke pê m waye dirêjxayen nedebû.

Le salî 1332-da xebatî gelanî Êran beraberayetî Musedîq serncî dinyay bo lay xoy rakêşa û Musedîq be yekem şexsî sal nasira.

Xebatî hîzbî Dêmoqratiş barêkî lebartirî be xoyewe girt û ta radeyekî zor pêşî çeprewî mindalane, ke rast û rast be qazancî koneperistî tewaw debû, gîra.

Minîş paş çend sal tûşî lawêkî rûnakbîr û têkoşerî kurd hatim ke çunke azadîxwazêkî şêlgîr bû birway be çareserkirdinî meseley netewayetî hebû û le zimanî yek degeyîştî.

Min lemêj bû hawarim dekird, babe raste rojnamekanî ser be hîzbî Tude rojnamey çak û bekelkin (berastîş wa bûn), belam derdî ême derman naken. Beşî zorî gelekeman farsî nazanê û le mebestî rojnamekan naga û Leser mesayîl rûn nabêtewe, belam bedaxewe zorim gwê nedediraye û tenanet çeprewî waman hebûn ke le eynî nexwêndewarî û nezanîda galteyan bew core bîrûbirwaye dekird û berdyan le ejinoy xoyan deda.

Ew lawe le qsem geyîşt, destelatîşî zor bû. Biryarman da rojnamey «Kurdistan» rojnamey hîzbî Dêmokratî Kurdistan yadgar û xoşewîstî Pêşeway nemirman serlenwê çap bikeynewe û be zimanî sakarî kurdî legel zehmetkêşanî gelekeman bidûwêyn û Leser mesayîl rûnyan bikeynewe. Xerîk bû awatî lemêjîney min bête dî, ke bedaxewe kudêtay şûm û reşî 26-î gelawêj bo maweyekî dûrudirêj lêkî cwê kirdînewe û wek babirdele heryeke bo layek heldaştî.

Ew lawe têkoşere paş çend sal awatî minî hêna dî û twanî rojnamey Kurdistan çap û bilaw bikatewe. Çwar jimarey ew rojnamem pêgeyîşt. Belam jimarey pêncî hergîz negeyîşte destim, çunke ew kesey rojnamekey bilaw dekirdewe bexoy û rojnamekeyewe gîra û hemû jimarekanî lenaw çûn. Min egerçî zorim pê xoş bû legel ew rojname hawkarî bikem û şitî bo binûsim, helûmercêkî nehênî ewto legorêda bû ke pê ranegeyîştîm hîçî bo binûsim.

Zor şit Leser kudêtay reş û şûmî 28-î gelawêj nûsirawe û gutirawe û dûpatekirdineweyan lêreda bêcê ye. Belam çunke ew kudêtaye teşîrî rastewxoy Leser jiyani min hebûwe û minîş yekêkim lew kesaney weber pelamar hatim û zorim renc û kwêrewerî û azar dît û gelêkim ziyani malî pêgeyîşt û derd û sizam çêşt, wîstim herwa beserîda têneperim.

Le rîfirandomî Musedîqda hêzî koneperistî û hêzî azadîxwazî zor baş radey destelatyan derkewt, betaybetî le Kurdistan, bo nimûne le şarî Mehabad ke dengdan azad bû û wek gutim hêsta koneperistî û erteş kem ta kurtêk cûleyan mabû, tenya dû kes be qazancî derbar dengiyan da, ewîş wek şahîdêkî zîndû agam lê heye lawêkî zor pak û çak le daxî çeprewî endamêkî bêkelkî hîzb dengî da û pitir le pênc hezar deng be qazancî Musedîq dira. Bewera diyare xebatî dijî împiryalîstî çendey pere girtibû.

Xelk lemêjbû xerîk bû cêjinî damezirandinî hîzbî Dêmokratî Kurdistan bigirê. Keçî xwawrastan lerojî 25-î gelawêjî 1332-da cêjinekeyan bû be dû cêjin. Lew rojeda bû ke şa leber tewjimî şepolî tûreyî xelk xoy negirt û ray kird û berew Bexda helat. Lewêş negîrsawe û hey dê bo Îtalya. Berastî rojêkî xoş bû.

Dukan û bazar daxiran û xelk rijane naw kûçe û xeyaban. Bû be hurakêşan û çepilerêzan û sema û helperîn. Jin û piyaw û gewre û biçûk lew zemawendeda beşdarbûn. Kobûneweyekî gewrey hîzbî le meydanî şar kira. Minîş paş rûxanî komarî Kurdistan bo yekem car şî rim bo xelk xwêndewe. Diyare şî rekanim bepele dirust kirdibû û le barî hunerîyewe zor baş nebûn, belam çunke îlhamim le xelk wergirtibû û bo xelk bûn, dû se`at pê neçû gewre û biçûk û jin û piyaw û mindalî şarekeman serbendî şî rekemyan dexwêndewe û deyangut «debiro ey şahî xa`n Bexda nîwey rêyet bê».

Sê rojan dengî dehol û zurna û tirîqey pêkenîn û rimbey helperîn le Mehabad nebirayewe. Belam bedaxewe em keyf û neheng û bezim û zemawende zorî dirêje nekêşa û rojî 28-î gelawêjî 1332 kudêtay şûm û reş û dijî gelfî - Dalîs - Eşref - Zahîdî sûk û hasan serkewt. Zahîdî ew efsere faşîst û koneperistey ke rojgarêk betawanî casûsî almanî nazî lelayen îngilîs û Emirîkawe gîra. Êsta beqazancî ewan û derbarî koneperist raberî kudêtay bedestewe girt û beserkirdeyî jimareyekî kem le efseranî koneperist û derkirawî erteş û desteyek piyawxirap û ketewkoşe û be piştîwanîy împiryalîzîmî îngilîs û Emirîka twanî cûlanewey azadîxwazî peregirtû û berbilawî Êran serkut bika û dewletî nîştîmanîy



Musedîq birûxênê û destelat bidatewe dest koneperistî û şay rakirdû, şay bezîw û şay xwênrejê û piyawkuj bigerênêtewe ser textî şûmî paşayetî û rojî 28-î gelawêj bika beseretay serdemêkî reş û şûm û xwênawîy mêjûy Êran.

Min bo xom pêw wanebû koneperistî be helatinê şa le Êranda binebir debê û împiryalizimî cîhanî wa sûkuhasan dest le xezubez û xêrubêrî Êran heldegirê, belam qet xeyalîşim nekird wa be hasanî zal bêtewe. Çunke cûlanewey azadîxwazî Êran zor behêztir lewe dehate pêş çaw.

Min namewê biçime qûlayî meselekewe. Belam ewende delêm eger raberanî cûlanewey azadîxwazî le Taran wedest dehatin û berengarî kudêtaçîyekan debûn, hergîz koneperistî neydetwanî beser cûlanewey azadîxwazîda zal bê û şa bigerêtewe Êran û wilatekeman bikate gomî xwên û ew hemû însane beşerefe bikujê û ew hemû xwêne pakane birêjê û ew hemû xeyanete be gelanî Êran bika.

Paş nîweroy rojî 28-î gelawêj zor be zehmet twanîm xom derbaz bikem û le Mehabad wederkewm û milî çiya bigirim. Maweyekî zor be kêwanewe bûm, şewane xom le gundêk dekuta û nan û awêkim dexward û be roj weçya dekwetim.

Polîs zor be tundî lêm degera û hereşey kuştinî lê dekirdim. Belam şwênî bo helnedegîram. Eweş le sayey yarmetîdanî xelk bû. Hemû kes ray degirtim, nanî dedamê, deyişardimewe, tenanet ewaney zor be şaperist meşûr bûn berastî çakeyan legel kirdim û zoryan memînûnim. Belam boye nawyan nabem boxoyan reng bê pêyan baş nebê.

Polîs ke destî wemin ranegeyişt kewte azardanî babim. Ewe minî zor narehet kird. Babêkî pîr û muhterem ke malî penagay lêqewmawan bû, êsta leser min sûkayetî pê dekira. Êstaş ke ewem webîrdêtewe narehet debim. Beweşewe ranewestan û gîşey gundekeyan têkra sûtandîn.

Wilatî ême zor kwêstane. Salî wa heye pênc mang befir eriz bernada û heywan û ajel leser axur û dangeye. Leberewe xelk naçare giya û wênce û kode û gizire û tifaqêkî zor daxa. Bedaxewe le qedîmewe adetêkî xirap le Kurdewarîda heye her kes riqî le yekêk hesta û be aşkirayî neywêraye gîşey desûtênê. Piyawekanî polîs be dizî gîşey gundekey êmeyan ke beser yekewe dandirabûn agir tê berda. Bêguman zererî ew sûtimane le sed hezar timen ziyatir bû. Êstaş ke webîrim dêtewe xelkî hejar û zehmetkêş û bê tawan le songey minda ew hemû ziyaneyan pêgeyişt û berhemî şan û pîlyan bû be jîlemo û ajele bestezimanekanyan bê tifaq manewe, kizem le cergî dê û lekin wîcdanî xom şermezar debimewe û xom be pişîley Recebe şêt dezanim.

Paş 28-î gelawêj zor le endamanî hîzb rûyan lenêw Menguran kird. Eşîretî Mengur be panewe, be axa û re`yetewe, be nedar û dewlemendewe baweyan bo kirdinewe.

Herçende hêndêk le têkoşeran pêşnyarî helayîsandinî şorişî çekdaryan da û le bîrme kaxezêkim bo hat ke çawenor be bew zûwane çek bilaw dekeynewe û şoriş dest pê dekirê, belam çî bas nebû. Bêguman lew wexteda ke eşîretî Mengur lew şwêne sext û qaymeda hawkarî hîzbî dekird, des pêkirdinî şorişî çekdarane karêkî mihal nebû. Pêw waye dewlet hestî bewe kird û gîrawekanî berdan û xelkî damezirandewe. Minîş paş çwar mang derbederî twanîm biçimewe malî xom û damezirêmewe. Lew maweda berastî renc û kwêrewerîyekî zorim dî û hêz û twanam ledest da.

Ewe bû beserhatî mindalî û lawî min. Çunke renc û kwêrewerîy jiyan le 30 salîda minî pîr kird, ser û rîşim boz bû, didanim şaş û waş bûn, çawim hukimî kem bû, hêz û twanam roj be roj le kemayesîda, hemû şitim berew neman çû. Bêcige le hestî şa`iranem ke be birway xom ta êstaş her le zêdeyîye û kemî nekirdûwe.

Le salî sî û dûra hemîşe lejêr çawedêrî polîsda bûm û polêkim casûs le dewrûberî gerawin.

Salî 1338 salêkî zor şûm bû le mêjûy jiyanî minda. Lew saleda sazimanî emînîyet gewretirîn zebirî le hîzbî Dêmokratî Kurdistan û cûlanewey azadîxwazaney gelî kurd weşand, ke bêguman lew serdemîda dekira be behêztirîn rêkxirawî siyasî rêkûpêkî Êranî bizanî.

Minîş lew serdemeda tûşî nexošîyekî rûhî hatim. Nahumêdîyekî reş asoy jiyan û bîrkirdinewey dagirtim. Ew nahumêdîye zor car ta halî xokuştin palî pêwenam. Namewê ew tawane bawêjime ser estoy kes, belam ewende delêm natebayî û nakokî naw xêzan û binemaley xoman zorî kar kirde ser min. Heley wam kirdin ke nedebû be hîç nirxêk biyankem û beser pelî wada kewtim ke debû xoyan lê biparêzim. Dû salî zor tal û tift û pir renc û kwêrewerîm rabuward û hezarcar mergm be awat xwast. Belam lepir ew mijuhewre rewî û gizingî hîwa serlenwê le asoy jiyanimda engut.

Lawêkî rûnakbîr û kurdêkî pak û beşeref ke bedaxewe nakirê nawî berim xoy û refîqanî ew lew maweda zor le hanam hatin û zorim legel mandû bûn. Le salî 1340-da serlenwê tê helçûmewe û hawkarî azadîxwazanim dest pêkirdewe, desteyek refîqî taze û têgeyîştû û rûnakbîrim peydakirdin, lebarî hunerîşewe şî`rekanim nek her baştir bûn, belke be birway xom têyan perand.

Le salî 1344-da lawêkî yekcar xoşewîst û xizmêkî zor nîzîkim ke le derewey wilat dejya û deyxwênd û hîwayekî zorim pê hebû mird, ew rûdawe zorî perêşan kirdim.

Hênde pê neçû le seferda bûm ke xeberî cergbirî mirdinî babimyan damê. Natwanim şerhî te`srî ew xebere Leser hestî xom bidem. Êsta ke ew dêrane denûsim be zehmet firimêskim bo radewestin. Ewende delêm derdî babmirdin derdêkî girane û piyaw le her temenêkda babî bimirê hest be hetîwî deka.

Dû sal paş dayikîşim mird. Babim piyawêkî bezîbik û zakûn bû. Qetî rû nededa mindalekanî. Tenanet be pîrîş min cigerem lekin nedekêşa. Dayikim zor ser û rûxoş bû û minî le hemû mindalekanî xoştir dewîst, keçî pêm seyre mergî babim zor pitirî kar kirde ser min û pitirî perêşan kirdim.

Salî 1347 le halêkda ke zor dewlemend û têrupir bûm û mal û dewletêkî zor le pêwîstî xom ziyatirim hebû û pîr û kenefîş bûbûm û demewîst goşegîrî bikem û lenaw jin û mindalî xomda bihesêmewe, zulim û zorî rêjîm nîsbet be gelî kurd geyîşte radeyek ke bo hîç însanêkî xawen şeref qbûl nedekira. Min çon çawim berayî deda lawanî têkoşer û rûnakbîrî kurdim her bew tawaney daway mafî reway netewayetî xoyan dekird, le pêş çaw bikujin û beweşewe ranewestin terimî xwênawî û kunkirawyan be şar û bajêranda be çepilerêzan bigêrin û dawet û semay le dewrî biken? Naçar be pîrî serî xom helgirt û be darî destî rûm le wilatî xerîbayetî kird û destim le jin û mindal û kesukar û yar û diyar helgirt.

Ewe pênc sal û çend mange aware û derbeder dexulêmewe û hejar gutenî her şewe mîwanî xanexwêyekim û her roje le cêyek. Zorim kwêrewerî û çermeserî çêştûwe, zorim şew û şewinxûnî kêşawe, zorim nedarî û rûtî dîwe. Eger jiyanî ew çend sale binûsim xoy sedan lapere kaxezî beş naka. Belam nehênîkarî îcaze nada.

Xwênerî xoşewîst hîwadarim twanîbim ta radeyek xom be to binasênim. Diyare toş çawenorî ewe nî hemû razekanî xom bo to gêrabêtewe.

Min însanim ne melayîkem û ne perî. Dexom, denûm, şad debim, werez debim, degirîm, pêdekenim, detirsim, nahumêd debim, darûberd nîm. Lew mawe dîrudirêjey jiyanimda zor karî çakim kirdûwe û beser xirapeşda kewtûm. Tenya karêkî xirapî ke dilnyam qetim nekirdûwe dizîye. Ewîş qet ewende muhtac nebûm mecbûr bim dizî bikem. Beçî me`lûm jiyan ewendem muhtac naka tûşî ew gunahêş bim ke zorim pê gewreye?

Nîweşewî sêy rêbendanî 1352 (24-î januyey 1974 û yekemî muherremî 1394) le nûsînewey ew sergurişte bûmewe. Êsta le şarêkî dûr wilat be taqî tenê le jûrêkî req û rûq danîştûm. Hemû samanim textêk û destêk nwên û dû dest bergî kon û nwê û çend kirasî çilkin û çemedanêk û sakêkî destî û çend cild kitêb û kolêk kaxezî bilawe û espê le gîrfanimda sewzeletan eriz deka. Belam zigtan pê m nesûtê. Ew jiyanim boxom helbijardûwe dena dostî wam hen eger hez bikem parûy le zarî xoyan derdênin û le zarî minî denên.

Ta ew nuxtem dana zîndû bûm û pişûm dehat û deçû û hîç reng mirdin nebûm. Ca nazanim key ser denê mewe û koçî dûwayî deferimûm?

Lêreşda demewê şitêk bilêm, bepêçewaney zor hunermendî kurd min le netewekey xom razîm. Kes ta êsta bêhurmetî pê nekirdûm. Daway diraw û malîşim le kes nekirdûwe ta bizanim demdatê ya na. Le lêqewmanîşda nanyan dawimê û rayan girtûm.

Şî rîşim tenya bo derbirînî îhsasî xom danawe û hîç heqim nîye minetyan beserda bikem. Ewan pêyan naxoş bê ya xoş min ke şî rim bo hat natwanim neylêm.

«Gelêk qşem le dila bû, hîkayetim mabû  
Keçî le bextî keçim xame nûkî lêre şika»

Leber şikanî nûkî xame nîye ke le gêranewey hîkayetî dilî xom waz dênim. Na min wek hemû însanêkî kurd betaybetî kurdêkî êranî hêsta le dinyayekî pir le esirarda dejîm û nakirê razekanî derûnim helrêjim. To bilêy kurd bigate cêgayek û minîş ewende bijîm herçî deyzanim bînûsim û qazancî le ziyar pitir bê?

Însanim. Jiyanim pê xoşe.

Pê m xoşe le şarî awedan, le şeqamî pak û xawên legel xoşewîstan bigerêm. Pê m xoşe le jûrî gerimugur Leser nwênî nerim werkewm. Pê m xoşe ser webaskêkî nerim û nol bikem. Pê m xoşe kam xorak xoşe lepêşim bê, pê m xoşe kam şerab çake le camimda bê. Demewê sema û helperînî nazdaran temaşa bikem. Demewê cwantirîn bale bibînim, bo çaktirîn opêra gwê rabigirim. Demewê beriztirîn semfonîm bo lê bidirê. Namewê derbeder û sergerdan bim, be tenê be kêw û şaxanda bigerêm. Le eşkewt û zendolan bixzê m, Leser berdî req binûm. Qondaxî req û sardî tifeng bikeme serîn. Nanî wişk û kerûwawî bixom, awî swêr û gerim bixomewe, pê m xoş nîye laqefirte û çengekirey nîwegiyanan bibînim, xwên û firimêskim weber çaw bikewê, pê m xoş nîye be teqey tifeng û girmey top û harey teyare rabiçenim.

Belam:  
Çi bikem, kurdim  
Koylem  
Ewane hemû û tenanet kujran û kuştinim pê le koyletî xoştire.

Hêmin 1974/1/23

Serçawe: saytî Vejîn  
<https://books.vejîn.net/ck/text/2837>

